
Rupel 1+++++:Layout 1  25.09.2010  17:17  Page 1



## Erdogan wekî nanê sêlê ye

**Hevserokê KCD'ê Turk got ku Erdogan rojekê bi hêvî dike piştî 2 rojan li dijî wê diaxive**

Hevserokê KCD'ê Ahmet Turk, der barê gotinên Serokwezîr Erdogan ên "ji me li benda perwerdehiya zimanê zikmakî nebin. Zimanê fermî tirkî ye" li herêmê bêhêvîtî pêk anî. Turk, got ku heke çanda gelekî winda bibe dê gel bi xwe jî winda bibe. Turk, li ser vê helwesta Erdogan jî wiha got: "Du rojên serokwezîr Erdogan ne wekhev in. Serokwezîr rojekê me bi hêvî dike. Roja duyemîn li dijî vê yekê tiştan dibêje. Ev yek jî hêviyan dişkêne."... *R.4*




## Kampanyayê pergala dewletê hejand

Kampanyaya TZPKurdî ya "Em bi zimanê dayikê perwerdehiyê dixwazin" bi dawî bû. Berdevka TZPKurdî Xecê Şen kampanya nirxand û diyar kir ku di pêvajoya boykotê de TZPKurdî gihîşt armanca xwe û wiha got: "Dewleta tirk hêvî nedikir ku tevgera ziman û gelê kurd helwestekê bi vî rengî ji bo asîmîlasyonê nîşan bide. Ev helwesta kurdan rayedarên dewletê tirsand."... *R.4*

www.welat.com

# Rojeva Welat

26 Îlon 2010 Yekşem Buha: 50 Kr Hejmar: 19 E-mail: awelat2002@yahoo.com

# Ziwan nîno qedexekerdiş



**Hetê Erdogan ra ze ke çalakîya antî demokratîk ame mojnayiş se zî, kişta zanyar, lêkolîner, mamosteyan û roşnvîran ra, ze heqê kurdan yê rewa ê demokratîk yeno vînayiş**

### PÎSPORÎY VANÎY ZIWANÊ MAYÎ REWA YO

Boykota TZPKurdî ke qabê perwerdeyîya ziwanê kurdî bibo ziwanê perwerdeyîya peynî. Bi her hawayî herêma kurdan di şar nêşîyo dibistanan. Erdogan hintakê şikyeno wa bivajo "Wa kurdîy kursan abikê û ziwanê xo bonder bibêy, kurdî nêbeno ziwanê fermî û perwerdeyî" zî, pisporîy dijî ney vatişê vanêy, heqê her netew esto bi ziwanê xo perwerdeyî bivîno, bimûso û perwerde bibo.

### 'PROBLEMÊ ZIWANÎ PROBLEMÊ TERORÎ NÎYO'

Sereka beşa Fen û Perwedeyîya ya Zanîngeha Bogazîçî Prof. Dr. Fatma Gok çalakîya kurdan a qabe ziwanê kurdî nirxna û vat: "Boykot herêma kurdan di bi ser kewt. Erdogan vano ti waxtan dê kurdî nêbo ziwanê fermî. No çî dijî vatişanê min o. Ez ney qebûl nêkena. Çimkî her netew biziwanê xo qisey kenêy. Kes nêşeno fekê kesan û çanda înan qedexe bikero."

### PERWERDEYA ZIWANÎ BI KURSAN NÊBENA


Gokî ard ziwan ke, kurs akerdiş çareyê esasî nîyo û vat: "Problemî sero eger bêro vindarnayiş se, hal dê zaf weş bibo. Lazim o ke merdimî kêmasîyanê xo bivînêy û ey cayî di kemasîyan wedarno. Eger wina nêbo se bêedaletey ra aver yewna çî nîyo. Lazim o Tirkîya, dewletan mîyan di aver şêro û goreya pîmitişanê (peymananan) navnetewan biko. Mafê waştişî kurdkî, mafêko demokratîk o." *RÛPEL - 9*

## Divê diyalog bibe muzakereyên fermî

Hevseroka BDP'ê Gultan Kişanak, diyar kir ku heta niha ew ji bo daxwaza "makezagoneke nû" derketine rê û dê ji niha û şûnda jî ji bo naveroka makezagona nû û demokratîk têbikoşin. Kişanak da zanîn ku divê diyalog veguhere muzakereyên fermî... *R.5*



## Dadgehê parastina kurdî qebûl kir lê...




Gelek girtiyên li Îzmîr, Amed, Êlih, Şirnex û gelek cihên din beriya niha xwestin ku bi kurdî parastinê bikin û serî li rayedaran dabûn. Lê ev daxwaza wan ji aliyê rayedarên dadgehê ve hatin redkirin. Lê 4'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Wanê, daxwaza 2 girtiyên ku xwestin di danişînê de bi kurdî îfadeya xwe bidin qebûl kir. Balkêş e di danişînên girtiyên din de kesên bi tirkî zanîbûn û bi kurdî parastin kiribûn zêde ceza xwaribûn... *RÛPEL - 4*




## Windakirina mirovan polîtîkaya dewletê ye

*Dayikên Şemiyê bi armanca winda bên dîtin û kujer bên darizandin, 287'emîn çalakiya xwe ya rûniştinê pêk anîn. Çalakiya "Bila winda bên dîtin, kiryar bên darizandin a ji aliyê ÎHD'ê û xizmên windayan hefteya 85'emîn li pey xwe hişt. Dayikên Şemiyê diyar kirin ku windakirina mirovan polîtîkaya dewletê ye... RÛPEL - 3*

## Înkara kurdî înkara kurdan e

Gelê kurd pêvajoyeke ji agir dijî. Dibe ku gelek kes bêjin ku di vê pêvajoyê de ne şer, ne xwîn û ne jî qetlîam bi qasî yên demên borî zêde nîn in. Lê ligel vê yekê jî ev roj rojên ji agir in. Înkara zimanê zikmakî tê çi wateyê? Li aliyekî hevdîtinên di navbera dewlet û kurdan de didomin û li aliyê din jî hewldanên provokatîf û daxuyaniyên ku hesasiyetên kurdan ên herî girîng tahrîk dikin ji rayedarên hikûmetê tên dayîn... *Tayîp TEMEL R.2*

## Divê zihniyeta Erdogan biguhere

Hefteya çûyî gelê kurd boykota xwe ya duyemîn jî bi awayekî serkeftî bire serî. Malbatên kurd li ser banga TZPKurdî zarokên xwe neşandin dibistanan. Rayedarên dewleta tirk ji vê çalakiyê gelekî zivêr bûn. Serê pêşîn Wezîra Perwerdehiyê Nîmet Çubukçu, piştre Serokwezîr Erdogan û Serokomar Gul bi zimanekî tund êrîşî çalakgeran kirin û gef li... *Samî TAN R.2*

## Li San Sebastianê Chaplînê kurd

Fîlmê Jano Rosebîanî 'Chaplînê Li Ser Çiyan' li Mihrîcana Filman a San Sebastianê bû. Rosebîanî, bi vî fîlmî xweşikatiya erdnîgariya Kurdistanê, dewlemendiya çandî û birînên ku bi salan dewam dike vedibêje... *RÛPEL - 11*



## Qurnefîl danîn ber deriyê girtîgeha hejmar 5



Beşdarên sempozyûma "Tirkiye bi rastiya Girtîgeha Leşkerî ya Amedê re hevrû tê" ya ji aliyê Komîsyona Edalet û Lêkolîna Rastiya Girtîgeha Leşkerî ya Amedê ve pêk hat û piştre mexdûrên Girtîgeha Amedê û malbatên wan, ji bo xizmên xwe yên hatine windakirin, qurnefîl danîn ber deriyê girtîgehê. Li ber deriyê girtîgehê kesên navên kesên ku di girtîgehê de jiyana xwe ji dest dane yek bi yek hate xwendin. Piştre parlamenterê DEP'ê ya berê Leyla Zana li ber deriyê girtîgehê got, "Vê girtîgehê gelek tişt ji me birin, lê gelek tişt jî bi me dan qezençkirin. Li gel ku me her roj ciwanekî/ê xwe winda kir, di aliyê din de jî me pêşerojê jî raçand."

www.arsivakurdi.org

# Divê zarokên kurd bi kurdî perwerde bibin



Derwêş M. FERHO

Weke her kesî mafê zarokên kurdan jî bi jiyaneke bi rûmet heye. Yek ji şertên herî girîng, perwerdeya wan ya bi zimanê dayikê ye. Li ser esasê gelek peyman, şert û dokumentên navneteweyî, wek Yekîtiya Neteweyan (UN), UNESCO, UNICEF, Yekitiya Ewropa (EU) û her wiha Peymana Mafên Zarokan de, mafê zimanê dayikê û perwerdeyê mafekî herî bingehîn tê pejirandin. Ev ji bo zarokên kurd jî rewa ye û divê minaqeşe li ser nebe.

Lê, ev bû sedsalek ku zarokên kurd ji wî mafî bêpar in. Mezintirîn neheqiyê dijîn. Li ba şûrê Kurdistan ji demeke kurt û vir de rewş hatiye guherîn. Li Bakur, Rojhilat û Başûr/Rojava hêj vê jiyana dijwar dijîn. Dewlet siyaseta asîmîlasyonê bi hemû hêza xwe ve didin meşandin.

Dewleta Tirkiyeyê jî gelek ji wan peymanan îmze kiriye. Welatên ku tirk lê dijîn wî mafî dixwaze. Û siyaseta asîmîlasyonê jî rexne dike. Lê di nava sînorên Tirkiyeyê de wî mafê bingehîn ji 20 milyon kurd re qedexe dike. Zimanê tirkî ji wan re mecbûr dike û dibe sebeba windakirina gelek pêşketinan di mêjiyê zarokan de. Dinya tev hemfikir e ku pêşketina mirov bi zimanê dayikê herî mezin e.

Bi milyonan zarokên kurd bi zimanekî biyanî, weke tirkî, têne "perwerde" û asîmilekirin. Çand û zimanê kurdî di sala 2010 de jî hêj qedexe ne û kurd di bin xetereya jenosîdeke çandî de ne.

Biryar û çalakiya TZPKurdî li gorî bîr û baweriya min pîroztirîn kar e. Her kurd, her demokratê tirk divê vê biryarê bipejirînin û lê xwedî derkevin. Kurd divê zimanê xwe di perwerdeyê de ferz bikin û tirkên demokrat jî divê alîkar bin.

Boykota TZPKurdî ji bo hefteyekê bi dawî dibe. Ji niha pê de çi divê bibe? Pêşniyara min ew e ku her serê mehê, rojek were bijartin û zarokên kurd neçin dibistanên ku hêlîna asîmîlasyonê ne. Di vê navberê de jî şert û mercên perwerdeya bi kurdî were amadekirin. Mînak, her roja zarokên kurd neçin dibistanan, li navenda bajarê ew lê, cihek were xuyakirin û zarok dersên xwe bi kurdî bibînin.

Perwerdeya bi zimanê kurdî mafê kurdan e û ne pêwîst e ji tirkan destûr were girtin. Ziman stûna neteweyê ye. Eger ew stûn bikeve hebûna netewe jî ji kok radibe.

Werin em perwerdeya xwe bi kurdî bikin. Dema dewleta tirk were ser zarokan û zorê bi kar bîne, li awayên çareyên din bigerin. Yekemîn çare ku were bîra me, bedel çi dibe bila bibe, ji hev diqetin. Encam çi dibin bila bibe. Xeter ji bêzimanbûnê mezintir nîne û divê kurd ji bo vê sedemê jî li zimanê xwe xwedî derkevin.

Pêşeroja kurdan di parastina zimanê wan de ye. Neteweyek bê zimanê dayikê nabe.



Samî Tan
sberbeyan@yahoo.com

## Divê zîhniyeta Erdogan biguhere

Hefteya çûyî gelê kurd kurd boykota xwe ya duyemîn jî bi awayekî serkeftî bire serî. Malbatên kurd li ser banga TZPKurdî zarokên xwe neşandin dibistanan. Rayedarên dewleta tirk ji vê çalakiyê gelekî zivêr bûn. Serê pêşîn Wezîra Perwerdehiyê Nîmet Çubukçu, piştre Serokwezîr Erdogan û Serokomar Gul bi zimanekî tund êrîşî çalakgeran kirin û gef li beşdarên çalakiyê xwarin. Ligel vê helwestê jî malbatên kurd li gelek bajarên Kurdistanê û metropolên Tirkiyeyê zarokên xwe neşandin dibistanê. Vê yekê mijara mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê xist rojeva Tirkiyeyê.

Her çiqas Serokwezîr Erdogan roja 24'ê rezberê gotibe, "Bila kes perwerdehiya bi zimanê dayikê ji me hêvî neke, li Tirkiyeyê zimanê fermî tirkî ye" jî wisa xuya dike ku ev mijara dê têkildarî kêşeya kurdî bi berfirehî were nîqaşkirin. Hikûmet xwe li giraniyê datîne, ji ber ku li gorî baweriya rayedarên tirk ew çendî mijarê taloq bikin û bi derengiyê bixin dê hejmara kurdîaxêvan ev çend kêm bibe. Ev dixwazin vî mafî bidin, lê naxwazin kes jê sûdê wergire. Lê belê Erdogan jî baş dizane ku ew demeke dirêj kurdan ji vî mafê rewa bêpar bihêle.

Ev mijar ji mêj ve di qada akademîk de tê nîqaşkirin. Gelek lêkolîner êdî li ser zimanê kurdî, mafê perwerdehiyê tezên xwe amade dikin. Her wiha gelek rapor û xebatên qadê têne kirin, civîn û komxebat di vî warî de pêk tên. Ez bi xwe jî beşdarî çend heban ji van bûme. Bo nimûne, Egîtîm-Sen di vî warî de xebatekê dimeşîne, di encama vê xebatê de namilkeyek bi navê "Girîngiya Zimanê Dayikê, Perwerdehiya bi Zimanê Dayikê" hate weşandin. Her wiha dîsa di çarçoveya vê xebatê de anketek hate kirin, kurteya encamên vê anketê hate ragihandin.

Wekî din "Enstîtuya Lêkolînên Civakî û Aborî ya Amedê (DISA)" der barê mijarê de raporek amade kiriye. Ev rapor jî dê roja 23'yê kewçêrê ji raya giştî re were aşkerakirin. Ji bilî van xebatan di bin banê Zanîngeha Sabanciyê de xebatek bi navê Hewldana Veguhartina Perwerdehiyê (ERG) heye, ew jî di vî warî de xebatekê dikin, heta niha çar civîn li dar xistine û rapor amade kirine. Di van civînan de pispor û nûnerên saziyên sivîl li ser mijarê gotûbêj kirine. Di van civînan de nûnerên wezareta perwerdehiyê jî cih girtiye. Weqfa Dîrokê di çarçoveya projeyekê civînên diyalogê li dar xistin. Li wê derê jî mafê perwerdehiyê hate gotûbêjkirin.

Di xebatan gişkan de ramana serdest ev bû ku perwerdehiya bi zimanê dayikê ji aliyê mafên mirovî û pedagojîk ve pêwîstiyek e. Lêkolîner û pispor diyar dikin ku civaka li Tirkiyeyê dijî civakeke pirzimanî ye, lê ji ber polîtîkayên pişaftinê ev pirzimanî her ku diçe kêm bibe. Bo nimûne li gorî anketa Egîtîm-Senê her ku nifşek derbas dibe ji sedî 20 axêver zimanên ji bilî tirkî kêmtir dibe. Her wiha li gorî rapora DISA'yê piraniya kurdên ku bi tirkî perwerde bûne, dibêjin wan 1-0 têkçûyî dest bi jiyana perwerdehiyê kiriye.

Encameke din a lêkolînan jî ev e; li ber pêkhatina mafê perwerdehiyê astengiya sereke zîhniyeta netewe-dewletê ye. Anketa Egîtîm-Senê nîşan dide ku civak bi rêjeyeke mezin (ji sedî 48) wekî mafekî suriştî dibîne. Nexwe civak li ber bicihanîna vî mafî ne asteng e, lê rayedar bi xwe, nemaze jî Erdogan li ber vî mafî asteng in. Lewma jî divê serê pêşîn zîhniyeta kesên mîna Erdogan biguhere. Heta ku ev zîhniyet neguhere, kêşe çareser nabin.




## Deng
# Înkarkirina kurdî înkarkirina kurdan e

TAYÎP TEMEL tayiptemel@walla.com

Gelê kurd pêvajoyeke ji agir dijî. Dibe ku gelek kes bêjin ku di vê pêvajoyê de ne şer, ne xwîn û ne jî qetlîam bi qasî yên demên borî zêde nîn in. Lê ligel vê yekê jî ev roj rojên ji agir in.

**Înkara zimanê zikmakî tê çi wateyê?**

Li aliyekê hevdîtinên di navbera dewlet û kurdan de didomin û li aliyê din jî hewldanên provokatîf û daxuyaniyên ku hesasiyetên kurdan ên herî gîrîng tahrîk dikin ji devê rayedarên hikûmetê dibarin.

Li aliyekê Berdevkê Hikûmetê Cemîl Çîçek dibêje, 'Divê muzakere û diyalog ji bo çareseriya pirsgirêkan bidomin û dema rijandina xwînê li Tirkiyeyê qediya ye. Divê pirsgirêk bi diyalogê bên çareserkirin.'

Li aliyê din berpirsyarê yekemîn ê hikûmetê Serokwezîr Tayyîp Erdogan dibêje; **'Ne mimkûn e ku zimanê kurdî bibe zimanê fermî. Heke bixwazin bila di kursan de zimanê xwe hînî hev bikin û pêş ve bibin.'**

Burhan Kuzu yê ku ji guhertinên Makezagonê berpirsyar e, dibêje; **'Heke em mafê zimanê zikmakî di qada perwerdehiyê de bidin kurdan, ew ê piştre dewleteke cuda jî ji me bixwazin.'**

Divê bê zanîn ku dema zimanê gelekê neyê qebûlkirin, tu mafên wî gelî nayên qebûlkirin. Heke zimanê kurdî li gorî qanûnên Tirkiyeyê fermî nebe, kurd tu caran fermî nabin û ne mimkûn e ku ew bibin welatiyên fermî yê Komara Tirkiyeyê.

Niha çi ferq di navbera neqebûlkirina zimanê kurdî û neqebûlkirina nasnameya gelê kurd de heye?

Ango Serokwezîr Erdogan dema dibêje; **'Ne mimkûn e ku zimanê kurdî bibe zimanê fermî û zimanê fermî tirkî ye' ma qey di heman demê de nabêje; 'Ne mimkûn e ku kurd bi nasname û hebûna xwe bibin welatiyên makezagonî yên Tirkiyeyê?'**

Bêguman li gorî her kesê xwedî aqil bi tenê wateyeke gotinên Erdogan heye û ew jî domandina polîtîkaya fermî ya dewletê ye.

Hin kurdên bêhiş ên ku bi israr dibêjin, 'ev hikûmet dixwaze pirsgirêka kurd çareser bike' divê van daxuyaniyên Erdogan ên dawiyê baş fêm bikin.

***

**Refleksa li dijî Xweseriya Demokratîk**

Li aliyekê Erdogan beriya demekê digot; 'Heta ku BDP li dijî PKK'ê dernekeve û jê re nebêje 'terorîst' ez pê re hevdîtinan pêk nayînim'.

Li aliyê din jî Erdogan ligel hevdîtinên ku nûnerên hikûmeta wî bi BDP'ê re çêkirîn, dîsa gotinên xwe yên berê dubarekirin. Ev jî nîşan dide ku Erdogan he çiqas hevdîtinan bi BDP'ê re pêk bîne jî di hundirê dilê xwe de hebûna BDP'ê qebûl nekiriye.

Li aliyê din Serokomar Abdullah Gul dibêje; **'Xweseriya Demokratîk ne daxwazeke masûm e û li pişt wê daxwaz û projeyeke nepenî heye'**

Niha cihê vê pirsê ye; Gelo heke kurd hebin û hûn hebûna wan qebûl dikin, ew ê çawa bibin xwedî statûyeke siyasî, civakî û çandî?

Du rê hene; An dê kurd wekî hemû gelên din daxwaza dewleteke serbixwe bikin û mafê dewletbûyînê bixwazin. An jî kurd dê di nava sînorên Tirkiyeyê de bi awayekî xweser hebûna xwe bidomînin.

**Gelo riyeke din heye?**

Heke Abdullah Gul û şirikên wî daxwaza kurdan a 'Xweseriya Demokratîk' qebûl nekin, divê bizanin ku kurd dê ji bo xwe daxwazeke statûyeke din bikin. Qebûlnekirina statûya kurdan a siyasî tê wateya qebûlnekirina hebûna nasnameya kurdan. Lazim e ev yek bi vî awayî bê fêmkirin. Kurd êdî ne ehmeq in ku fêm nekin ka rayedarên dewletê çi dibêjin. Erdogan û Gul jî bi awayekî vekirî hebûna nasnameya gelê kurd înkar dikin.

Gelo piştî vê yekê kîjan kurd dê bawer bike ku Erdogan dixwaze pirsgirêka kurd çareser bike?

## XAÇEPIRS


**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Dermanekî reş î ku li çavan didin da ku bedewiyê bide û êşan bibire... Negihîştî, ji bo meywe û sebzeyan tê gotin **2.** Eşîr, qebîle, hoz... Lîsteya ku rewş û stêrkan nîşan dide **3.** Ajala xwedî têjik... Rengek **4.** Generalê deryayê**5.** Tûj... Tiştên ku ji nifşên berê hatine wergirtin 6. Ji wî/ji wê **7.** Keç... Bi rûsî erê... Rêxistina polîsan a naziyan **8.** Rojek... Gemara heywanên bibask **9.** Çiyayekî me... Bal

**Ji jorê ber bi jêrê ve l**

**1.** Kesên ku di civatekê de ji hêla çawanî û hejmarî ve hindik in... Keleşêr **2.** Bajarekî me... Nexweşîneke çerm e ku bi taybetî di gewde, çîm û rû de wekî kelepotkan xwe dide nîşan **3.** Hest û daxwaza tolhildanê **4.** Kanaleke televîzyona kurdî... Hejmarên du, çar, şeş, heyşt û hwd. **5.** Lehengê destana Newrozê... Ji vir û şûnde, ji niha pê de **6.** Tîpên navîn ên "raye"yê... Xanedana qraliyeta Vîetnamê... Genimê hêrandî **7.** Cihê ku çûk û teyr xwe lê datînin... Yezdanekî misrî... Qenc **8.** Gotinên ne li rê, ku ne li derveyî terbiyeyê ne **9.** Kesê ku deng naçê, kesê ku guhê wî nabihîze... Beşer, mirov

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Î | Ş | ■ | K | A | R | ■ | Ê | Z |
| 2 | Z | E | B | E | Ş | ■ | L | ■ | Î |
| 3 | ■ | R | O | J | ■ | H | I | B | R |
| 4 | D | Î | Z | ■ | R | E | ■ | E | Ç |
| 5 | O | F | ■ | S | E | R | A | Y | ■ |
| 6 | S | ■ | Î | ■ | Ş | E | P | A | L |
| 7 | T | A | L | Î | ■ | K | ■ | R | A |
| 8 | ■ | L | O | N | D | O | N | ■ | M |
| 9 | V | Î | N | ■ | A | L | A | N | ■ |



# Bila aqûbeta windayan diyar bibe

## Çalakiya bo windayan a ji aliyê ÎHD'ê û xizmên windayan ve tê lidarxistin hefteya 85'emîn li pey xwe hişt. Serokê Giştî yê ÎHD'ê Ozturk Turkdogan, destnîşan kir ku lazim e dewlet arşîvan veke û debarê vê daxuyaniyekê bide

**AMED - ÊLIH / DÎHA -** ÎHD û xizmên windayan, çalakiya her hefte bi dirûşma "Bila winda bên dîtin, kiryar bên darizandin" li dar dixin di hefteya 85'emîn de li ber Bîrdara Mafê Jiyanê ya Parka Koşuyoluyê dom kir. Serokê Giştî yê ÎHD'ê Ozturk Turkdogan, rêveberên ÎHD'ê, rêveberên MEYA-DER'ê, nûnerên sendîqayên girêdayî KESK'ê û malbatên windayan beşdarî çalakiyê bûn.

Di çalakiya wêneyên windayan hatin hilgirtin de Sekreterê ÎHD'a Amedê M. Racî Bîlîcî, qeyda deng a JÎTEM'cî Arîf Dogan a di çapemeniyê de derketi bi bîr xist û wiha got: "Arîf Dogan, îdiayên me bi dehan caran anîn ziman bi dengê xwe îtîraf kir. Beriya niha Koramîral Atîlla Kiyat jî îtîrafên di heman şibê de kiribûn û gotibû gotibû ku cînayetên kiryar nediyar bi agahiya dewletê pêk tên. Wekî parêzvanên mafên mirovan me ev yek timî digot. Me her car got ku ev kuştinên kiryar nediyar bi agahiya dewletê pêk tê."

**'Vaye ji were agahî û belge'**

Bîlîcî, destnîşan kir ku li gel hemû kedên tên dayîn di warê kişifkirina cînayetên kiryar nediyar de tu tişt nayên kirin û wiha axivî: "Serokwezîr û rayedarên hikûmetê dixwazin ên agahî di destê wan de hebin serî li wan bidin. Ma ji agahî û belgeyên ji van zelaltir hene? Eger dewlet bixwaze di nava 24 saetan de bibîne. Em di ronahiya van agahî û belgeyan de banga berpirsiyariyê li dewletê dikin."

**'Divê arşîv bên vekirin'**

Serokê Giştî yê ÎHD'ê Ozturk Turdogan jî diyar kir ku divê êdî di mijar windayan de tiştek bê kirin û wiha got: "Ez bang li rayedarên dewletê dikim êdî arşîvên di destê xwe de ji rayagiştî re vekirin. Di arşîvên artêş û dewletê de windayî li ku derê veşartinî tê nivîsandin. Em vê yekê baş dizanin. Ji ber vê yekê arşîvan vekin. Li Tirkiyeyê bi deh hezaran malbatên bi êş hene."

**'Benik kiribûn stûyê wî'**

Piştî axaftinan çîroka Tahîn Çiçek, Alî Îhsan Çiçek û Çayan Çiçek ên di 10'ê gulana 1994'an de hatin binçavkirin û piştre ji hatin windakirin ji aliyê Kurê Tahsîn Çiçek Serhat Çiçek ve hate vegotin. Çiçek, diyar kir ku di wê demê de leşkerên Tugaya Komandoyê yên Boluyê bi ser gund de girtin û wiha got: "Serê sibê leşkeran bi ser gund de girt. Gundî li mizgeftê kom kirin û lêpirsîna nasnameyan kirin. Piştî lêpirsîna nasnameyan gundî belavbûn. Piştî 10 deqeyan bavê min Tahsîn Çiçek, Apê min Alî Îhsan Çiçek û 6 kesên din girtin û bi riya çiya ve birin. Ew biribûn dibistana şevînî ya Liciê. Li ser hemû serlêdanên me tu encama me bi dest nexistin. 27 roj şunda birayê minê astengdar ji ber ku nasnameya wî li cem nebû di nav baxçe de birin. Benik kirin stûyê wî û 10 kilometreyan bi erdî re rakêşandin wisa birin. Me ji sala 1994'an heta niha tu agahî jê negirtin."




Çiçek, diyar kir ku divê dewletek bi welatiyên xwe re aramî, demokrasî û azadiyê ava bike û wiha got: "Mixabin li welatê me dewlet mirovan dikuje. Her wiha heta niha rê li pêşiya 17 hezar kuştinên nediyar vekiriye. Ji ber ku em kurdin û li vê herêmê dijîn em rastî işkence, lêdan û binçavkirinan hatin. Niha birayekî min leşker e. Min 3 mirov kirin qurbanê vê dewletê. Êdî tehamula min a ez şehîdekî din bidim tune.

**Bila kujer bên darizandin**

ÎHD'a Êlihê çalakiya "Bila winda bên dîtin û kiryar bên darizandin" ya vê heftiyê ji ber hewaya bi toz li avahiya komeleyê li dar xist. Rêveberê ÎHD'a Êlihê Nihat Ekîncî, diyar kir ku piştî daxuyaniya li ser tesîsên Sînan Çalên mirinên ya li Silopî, ev pêvajo bê navber didom e. Ekîncî, destnîşan kir ku encamên xebatên têkildarî mijarê ya salekê, rewşa vê qadê tîne ber çavan. Ekîncî, anî ziman ku ew dê akûbeta bi dehan mirovên kû di salên 1990'an de di bin çav de hatin winda kirin, bipirsin. Ekîncî, xwest e kiryar bên dîtin.

### Îtirafa Atîlla Kiyat bi bîr xistin

**STENBOL -** ÎHD'a Stenbolê û Dayikên Şemiyê di 287'emîn hefteya çalakiya xwe de dîsa li Qada Galatasarayê kom bûn û bi armanca winda bên dîtin û kujer bên darizandin daxuyanî da çapemeniyê. Komê di çalakiyê de pankarta "Faîl diyar in, lê winda li ku ne" vekirin û wêneyên windayan rakirin. Xizmên windayan bêdeng dest bi çalakiya rûniştinê kirin û aqûbeta Yusuf Tunç ê di 9'ê sibata 1994'an de li gundê Kengerli hate windakirin pirsîn. Li ser navê komê Endama Komîsyana Girtîgehan a ÎHD'a Stenbolê Ozgur Sevgî Goktaş, daxuyanî xwend û diyar kir ku heta aqûbeta windayan diyar nebe ew dê çalakiya xwe bidomînin.

Goktaş, çîroka Yusuf Tunç vegot û diyar kir ku leşkeran bi îdîaya sixinak di mala wan de heye bi ser mala wan de girtibûn û piştî Tunç binçavkirin û şûnde êdî tu agahî jê nehat girtin. Goktaş, da zanîn ku piştre tu agahî ji Tunç negirtin û wiha axivî: "Malbata Tunç 16 sal in li Yusuf digerin. Ji bo Yusuf Tunç bibînin serî li gelek cihan dan û ji ber vê yekê jî gelek caran rastî gefan hatin. Serî li Fermandariya Cendermeyan a Dirbesiyê jî dan."




# Li Şirnexê pêla binçavkirinê hêj didome

**ŞIRNEX -** Li Şirnexê piştî 3 roj berê 5 kes di serdagirtinên malan de hatibûn binçavkirin, duh jî di serdagirtinên 2 malan de 2 kesên din hatin binçavkirin.

Li Şirnexê 3 roj berê di serdagirtina 4 malan de 5 kes hatibûn binçavkirin. Ligel ku lêpirsîna 5 kesan li Midûriyeta Polîsan a Bajar didome, duh jî 2 kesên din li taxa Nuh di serdagirtina malan de hatin binçavkirin. Di dema serdagirtinan de polîsan mal belavel kirin. Di encama serdagirtinê de Sedîk Batmaz û Mûsa Kutler bi hinceta "Erzak ji PKK'ê re birine" hatin binçavkirin. Birayê Kutler, Abdulkerim Kutler, nerazîbûn nîşanê serdagirtinê da û wiha got: "Ma sûcê me çiye. Gazî me bikin em dê jixwe biçin îfadeya xwa bigirin. Li gorî kêfa xwe di ser malê de girtin. Zarokên me gelek tirsiyan. Ev ne mirovahiyê." Her wiha hate diyar kirin ku kesên din yên hatine binçavkirin jî bi heman hincetê hatine binçavkirin. Pêr jî têkildarî mijarê, polîsan qeydên telefonên Şaredariya Şirnexê xistin bin lêkolînê.

# 'Ji bo girtiyên nexweş azadî'

**ENQERE -** Rewşenbîr, nivîskar û nûnerên saziyên civakî yên sivîl, bi armanca balê bikşînin ser rewşa girtiyên nexweş, her wiha ji bo girtiyên nexweş serbest bên berdan bang li Wezîrê Dadê û Wezîrê Tenduristiyê kir û ji girtiyan re azadî xwestin.

Gelek endam û nûnerên TAYAD, EHP, ÇHD, "Genel İş, Eniya Gel, ESP, Hewldana 78'an, hunermend û rewşenbîr ên li Enqereyê, bi armanca balê bikşînin ser rewşa girtiyên nexweş, her wiha ji bo girtiyên nexweş serbest bên berdan li Kolana Sakaryayê daxuyanî dan çapemeniyê. Komê di daxuyaniyê de pankarta "Bila girtiyên nexweş serbest bên berdan" vekirin û dowîzên "Tecrîdê rakirin mirinan rawestînin", "Em li girtiyên nexweş xwedî derkevin" rakirin. Komê bê navber dirûşmeyên "Bila TAYAD'î serbest bên berdan", "Bila Bekîr Şîmşek serbest bê berdan", "Bila Erol Zavar serbest bê berdan" berz kirin.

Li ser navê komê Başak Kavruker, daxuyaniyê xwend û diyar kir ku hikûmet û feresata serdest dixwaze şoreşgeran di qada fikr û ramanê de qetil bike û bê vîn bihêle. Kavruker, anî ziman ku hikûmeta AKP'ê jî xwedî heman feraset e û vê daxwaza pergalê bi cih tîne. Kavruker, da zanîn ku nexweşê Wernicke Korsakof Bekîr Şîmşek rewşa wî giran e wiha got: "Li aliyekî dixwazin girtiyên şoreşger di warê fikr û ramanê te qetil bikin. Li aliyê din girtiyên nexweş derman nakin û wan bi kuştinê re rû bi rû dihêlin. Kavruker, bal kişand ser Erol Zavar û destnîşan kir ku heta niha 10 caran amaliyat bûye û hêj serbest nayê berdan. Kavruker, da zanîn ku girtiyên bi navê Ufuk Keskîn û gelek girtiyên din jî rewşa wan giran e û wiha got: "Em bang li Wezîrê Dadê, Wezîrê Tenduristiyê û hemû rayedarên dewletê dikin û dixwazin bi lezgînî van girtiyan serbest berdin."

# 13 endamên SDP'ê hatin girtin

**STENBOL -** Serokê Giştî yê SDP'ê Ridvan Turan û Berdevkê TOP'e Oguzhan Kayseriliogu jî di nav de 13 kes bi îdiaya têkiliya wan bi rêxistina "Biryargeha Şoreşgerî" re heye hatin girtin.

Midûriyeta Polîsan a Stenbolê û Enqereyê, di 21'ê îlonê de li Stenbol û Enqere hemwext bi ser gelek malên rêveberên SDP'ê û avahiyên SDP'ê yên Stenbolê de girt û ligel Serokê Giştî yê SDP'ê Ridvan Turan û Berdevkê TOP'ê Oguzhan Kayserîliogu 17 kes binçavkiribûn. 17 kes piştî 4 rojan di bin çavan de man bi îdîaya têkiliya wan bi rêxistina "Biryargeha Şoreşgerî" re heye derxistin Edliyeya Beşîktaşê ya Stenbolê. Piştî dozgeriyê îfadeyên 17 kesan girt 2 kes serbest berdan û 15 kes jî bi daxwaza girtinê sewqî dadgehê kir.

Heyeta Dadgehê jî piştî li îfadeyên 15 kesan guhdar kir, 2 kes serbest berdan. Her wiha heyetê der barê 13 kesên di navde Serokê Giştî yê SDP'ê Ridvan Turan û Berdevkê TOP'e Oguzhan Kayseriliogu jî heye, bi îdîaya têkiliya wan bi rêxistina "Biryargeha Şoreşgerî" re heye biryara girtinê da û ew şandin girtîgehê.





# Goktaş ev bû 6 roj ku winda ye

**MÊRDÎN -** Zarokê 14 salî yê bi navê Lokman Goktaş ê ji gundê Mewîjo yê navçeya Qoserê 6 roj in tu agahî jê nayê girtin.

Zarokê bi navê Lokman Goktaş ê 14 salî ku 6 roj berê ji gundê Mewîjo hat navçeya Qoserê agahî jê nayê girtin. Bavê Goktaş Fahrî Goktaş, diyar kir ku kurê wî di 20'ê îlonê de çû Qoserê û piştre venegeriya. Bavê Lokman Fahrî Goktaş xwest kesên kurê wî dît agahiyê bidin wî û wiha got: "Min serî li Qereqola Dirbêsiyê da. Lê heta niha tu agahî nedan min. Ez dê serî li ÎHD'ê jî bidim û alîkariyê bixwazim."

# Muzakereyên fermî divê

## Hevseroka BDP'ê Kişanak anî ziman ku hevdîtinên tên kirin bo diyalogê destpêkek e û hêvî dikin ku dîyalog vegere muzekereyê û pirsgirêk bi makezagonekê nû çareser bibe

**ÎZMÎR** - Hevseroka BDP'ê Gultan Kişanak, diyar kir ku heta niha ev ji bo daxwaza "makezagoneke nû" derketine rê û dê ji niha û şûnda jî ji bo naveroka makezagona nû û demokratîk têbikoşin. Kişanak da zanîn ku divê diyalog veguhere muzakereyên fermî.



BDP'a Îzmîrê di çarçoveya "Kampanyaya Malî" de li Salona Dehwetê ya Araratê ya Narliderêyê xwarinek da. Di xwarinê de Hevseroka BDP'ê Gultan Kişanak bi karsazên kurd ên li Îzmîr re hate cem hev. Ji bilî Kişanak, Endamê MYK'ê yê BDP'ê û endamên PM'ê yên BDP'ê Nîzamettîn Ozturk, Hayrî Ateş, Yildiz Aktaş, Mehdî Aslan, Oktay Konyar, Mehmet Bayraktar, Ahmet Demîroglu, Hevserokên BDP'ê yên Îzmîrê Yusuf Kaya, Mukaddes Kubîlay, Şaredarê Ovaeymîrê yê BDP'î Muzafer Yondemlî û gelek karsaz tevlî xwarinê bûn. Vekirina axaftinê Hevseroka BDP'ê ya Îzmîrê Mukaddes Kubîlay kir.

Kişanak, diyar kir ku biryara wan ya "boykot" li gelek deverên Tirkiyeyê bi bandor bû. Kişanak, anî ziman ku gelê kurd bi boykotê helwesta xwe nîşanda û êdî hewcehî bi makezagonekî nû heye.

Kişanak, da zanîn ku polîtîkayên pirsgirêka kurd ên wekî "ewlehî, teror" îflaskirine û wiha got: "Êdî encamên derketin holê yên zanebûna siyasî nayên manîplekirin. Pirsgirêka kurd pirsgêkî siyasî ye. Divê riyên çareseriyê jî siyasî bin. Heke ji bo çareseriyê vîna gelê kurd û nûnerên gelê kurd neyên dîtin tu çareserî pêk nayê. Êdî ev yekê ji aliyê hemû kesî ve tê zanîn. Ev pirsgirêk pirsgirka demokrasiyê, azadiyê ye. Em wekî BDP di vê pêvajoyê de muhatabê yekemîn e. Hevdîtinên tên kirin ji bo diyalogê destpêkek e. Em hevî dikin ku ev dîyalok vegere muzekereyê û pirsgirêk bi makezagonekê nû çareser bibe. Ev yek jî dê bi têkoşîna gelê me pêk bê."

Kişanak, bilêv kir ku ew heta niha ji bo daxwaza makezagonekê nû derketin rê û niha şunda jî dê ji bo naveroka makeqanûna nû têkoşînekê bimeşînin û wiha axivî: "Dê rêzgezên vê makezagonê çawa bin? Çareseriya pirsgirêka kurd dê di vê makezagonê de çawa be? Dê çawa nêzîkî çandên cuda, nasname, bawerî û cudahiyên bibin. Dê têkoşîna me ji bo vê yekê be. Em mafê hemwelatiya makezagonî dixwazin. Em perwerdehiya bi zimanê xwe dixwazin. Em xweseriya demokratîk dixwazin." Xwarin bi konsera Xemgîn Bîrhat bi dawî bû.




# Divê dewlet ji bo Girtîgeha Amedê lêborînê bixwaze

**AMED** - Komîsyona Edalet û Lêkolîna Rastiya Girtîgeha Leşkerî ya Amedê sempozyûma "Tirkiye bi rastiya Girtîgeha Leşkerî ya Amedê re hevrû tê" pêk anî. Di sempozyûmê de Serokê Yekitiya Baroyên Tirkiyeyê Av. Vedat Ahsen Coşar, diyar kir ku hevrûbûna bi wehşeta Girtîgeha Amedê re têrê nake û xwest dewlet lêborînê bixwaze. Coşar, anî ziman ku lêborîna herî baş Girtîgeha Amedê bikin muze ye.

Nûnerên rêxistinên civaka sivîl, rewşenbîr, nivîskar, rojnamevan, siyasetmedar, maxdûrên Girtîgeha Amedê û malbatên wan tevli sempozyûmê bûn. Piştî rêzgirtinê maxdûra 12'ê Îlonê Nîmet Tanirkulu axaftina vekirinê kir. Tanrikulu, diyar kir ku hovîtiya Girtîgeha Amedê di dîroka cihanê de tekane mînake û wiha got: "Di gelek girtîgehên cihanê de îşkence li mirovan kirin, lê îşkenceyên di Gîrtîgeha Amedê ya Hejmar 5 de bi taybet bûn. Li wê derê bi rûmeta mirovahiyê re hate lîstin." Tanrikulu, di berdewama axaftina xwe de anî ziman ku ji bo edeletê li vê derê ne. Serokê Baroya Amedê M. Emîn Aktar jî diyar kir ku kesên ku di Girtîgeha Amedê de îşkece dîtine, tu carê nekarîne serpêhatiyên xwe ji zarokên xwe re vebêjin, lê zarokên wan niha serbild dijîn.

Serokê Yekitiya Baroyên Tirkiyeyê Vedat Ashen Coşar jî di sempozyûmê de axivî û diyar kir ku tiştên li di Girtîgeha Amedê de pêkhatin wî wekî însanekî dide şermê û wiha got:

"Ev wahşet şerma Komara Tirkiyeyê ya herî mezin e. Nayê hesîbandin ku ev wehşet nehatiye jiyîn. Ji ber yekê divê bi vê yekê re rup rû bê. Divê lêborîn bê xwestin. Divê ev lêborîn di pratîkê de bê avêtin û ev yek jî divê Girtîgeha Amedê bibe muze. Ji bo ku wijdanên me zindî bibine gelek girîng e." Şaredarê Bajarê Mezin ê Amed Osman Baydemîr da zanîn ku heta bi Şex Saît, Seyît Riza û Koçgîrî, bûyerên di salên 1915'an de rû bi rû neyên bi 12'ê Îlonê re nayên û wiha pê de çû: "Divê bi Mazlûm Dogan, Necmettîn Buyukkaya û Îbrahîm Kaypakkaya re rû bi rû bên. Ji bo ku bi wehşetê re rû bi rû re bên divê Girtîgeha Amedê bibe muze." Piştî axaftinan mexdûr û şahidên Girtîgeha Amedê tiştên jiyîn vegotin û li ber girtîgehê daxuyanî hate dayîn.

# BDP xebatên hilbijartin û dema nû dide destpêkirin

**ENQERE** – BDP'ê di pêvajoya referandûmê de bi helwesta "boykotê" hêzekî baş bi dest xist û amadekariyên xebatên hilbijartina giştî dide destpêkirin. Ji ber vê yêkê BDP lijneyên xwe yên eleqedar kom dike û amadekariyên pêvajoya nû dide destpêkirin.

BDP, bi armanca amadekariyên hilbijartina giştî ya dê di 2011'an de pêk bê, lijneyên xwe yên eleqedar kom dike. BDP'ê di demekî kin de civîna MYK'ê pêk anibû û dê di 2-3'yê cotmehê de jî civîna Meclîsa Partiyê kom bike. Pişt re jî dê civîna serokên bajaran pêkbîne û dê di civînan de piranî li ser encama referandûmê dê bikerinin û xebatên pêşerojê binirxînin. Di civînan de li bendên ku ji bo pêvajoya diyaloga ya ji bo çareseriya pirsgirêka kurd dest pêkir jî xebatek dest pê bike.

BDP'ê di civîna MYK'ê de encamên referandûmê nirxandibûn û encama derket holê wekî serketinek nirxand. BDP'ê li gel hemû zext û zordariyên AKP'ê û zordariyên hêzên dewletê biyara boykotê encamekî erê girt û bi vê yekê gelê kurd daxwaza xwe ya çareseriyê û ya xwedî derketina Xweseriya Demokratîk nîşan daye. BDP, ji bo ev rêxistînî mayînde bibîne dê xebatên xwe bi hêz bike. Rêveberiya BDP'ê biryara boykotê bi giştî serkeftî dît û hinek herêm xistin bin mercekê. Bi taybet Bedlîs, Çewlîk, Riha, Îdîr, Mûş û Agirî wekî herêmên xebatekî bi hêz û taybet lê bêkirin hatin nişandan. BDP'ê biryara ku rêxistinên van herêman jî bihêz bike girt û dê di nava mehekê de li van bajar û navçeyan rêxistinan li ber çav derbas bike û ji nûve plansaziyekê pêk bîne.

### Dê start bê dayîn

BDP, li ser ecamên di van civînan de derdikevin holê dê xebatên hilbijarta giştî di meha mijdarê de bi de destpêkirin. BDP ji bo dengên xwe zêde bike xebatê zû dide dest pêkirin û li gorî herêman dê xebatên taybet bikin. BDP ji bilî xebatên hilbijartinê dê xebatên parlamentoyê jî plan bike û ji bo pirsgirêka kurd hinek xebatan bide destpêkirin. Li gorî agahiyan BDP'ê ji bo hevdîtinên bi hikûmetê re serokên komê peywirdar kirine û ji bilî hevdîtinên fermî tu hevdîtinan qebul nakin. Kî tê li ser kijan bingehê tevlî hevdîtinan bibe û dê di hevdîtinan de kijan mijar bên nirxandin jî dê serokên komê biryarê bidin.

# Erdogan ji bo ziman li hincetan digere

**ENQERE** - Serokê Giştî yê EDP'ê Ziya Halîs anî ziman ku AKP di çareseriya pirsgirêka kurd de samîmî nîn e û Erdogan ji bo daxwaza kurdan a ji bo ziman hincetan dibîne û wiha got: "Erdogan got zimanê fermî yê Tirkiyeyê bi tirkî ye. Erdogan li hincetan digere."

Serokê Giştî yê EDP'ê Ziya Halîs der barê referandûm û pêvajoya di avahiya partiyê de daxuyanî da. Halîs axaftinên Erdogan yên der barê elewiyan rexnekir û anî ziman ku gotinên Erdogan yên dema referandûmê elewî acîzkiriye.

Halîs anî ziman ku AKP di çareseriya pirsgirêka kurd de samîmî nîn e û wiha pê de çû: "Heta niha min ji kurdan nebihîst ku bila kurdî bibe zimanê fermî. Erdogan dixwaze meseleyê berowajî bike. Daxwaza kurdan ya ji bo zimanê zikmakî daxwazeke di cih de ye. Daxwaza rêveberiyên herêmî jî di cih de ye. Ne rast e ku hinek derdor bi hinceta perçebûnê li dijî vê daxwazê derdikevin."

Mizgîn Bîngol
bingolmizgin@gmail.com



# Kesek qasî me aştiyê naxwaze

Mirov heta ku zehmetiyan nebîne qimeta aramiyê nizane, heta dil di nava xwe de neqûrife şadbûnê nizane, heta mirov şer nebîne hesreta aştiyê nakişîne. Me kurdan êşên mezin kişand, ha yên welatparez ha yên li dij tevgera gelê kurd para xwe ji şerî girtin. Em, nifşê ku niha navsal in bi şer mezin bûn û wa ye pîr dibin, rojên me awarte ne, hezkirinên me awarte ne. Me hevalên ku qasî roniya çavên xwe ji wan hezdikir di vî şerî de winda kirin, buyerên ku xelk di filman de temaşe dike em rojane jiyan/dijîn. Şopandina polîsan, kuştin, binçav kirin, îşkence û windahiyên di bin çavan de em kîjan nejiyan?

Van rojan dîsa hevditînên nunerên BDP'ê û dewletê di rojevê de ye. Piştî refandûmê ku kurdan bi boykota xwe hêzeke mezin da rayedarên kurd, edî dewlet dibîne bi PKK'ê re rûnene nikare ev pirsgirêk çareser bibe. Her ku gelê tirk qasî me kurdan yek û yek dijwariya şer neditîbe jî edî Tirkiye nikare vî şerî ragire. Em dibînin, berê nivîsandina navê Ocalan qedexe bû niha nivîskar dinivisînin û ew dibêjin divê dewlet bi Ocalan re rûne. Bêguman ev asta ku Dewleta Tirk hatiye û ketiye nava tevgera ku pirsgirêka kurd çareser bike bi hêsirên çavên dayikên kurd hate ava kirin. Ji bo ku dewlet gavên wêrek biavêjin divê di serî de xwe ji kompleksên xwe yên dîrokî rizgar bike, bizanibe bi gelên cuda re bijî, û rêzê nişanî rengên din bide. Dev helwesta dewleta unîter berde, gotinên vala weke gotinên, yek dewlet, yek milet, yek netew u yek alan biavêje çopê.

Bi têkoşîna kurdan û tevgera kurdan a zelal Tirkiye mecbûr e edî navekî li pirsgirêkê dike û edî nikare înkara pirsgirêka kurd bike. Nikare pirsgirêka kurd wekî mijara ewlewiyê nîşan bide.

Kesek qasî me aştiyê naxwaze lê divê siyasetmedarên kurd bi helwesta yên ew xwediyên vê axên e tevbigerin, ew hesreta ji min re dimîne kesekî ji tirkan re negot, 'divê esas rewabûna we ya li Anatoliyayê divê bê nîqaşkirin'. Niha siyasetmedarên kurd bi helwesteke zelal tevdigerin, aşkera li PKK'ê xwedî derdikevin, me berê jî gotiye, rêbaz, nêzikatî û bernameyên zelal yên daxwazên kurdan bi xwe re zelal bûnekê dide yê hemberî kurdan jî. Niha kurd ber bi asteke cuda ve diçin û di vê astê de divê bêşert û merc statuya kurdan pir aşkera bê diyarkirin. Ez bi xwe westiyame ku îzaha çima Kurdistan li ser nexşeya cihanê ya fermî tûne bikim. Zarokên me li welatên ewropî muameleya nebaş dibînin. Daxwaza kurdan ya statuyeke cografîk û çandî divê wekî daxwaziyeke zêde neyê ditîn. Me pir êş kişandin û ji bo ku dawî li êşên kurdan bên divê kurd dev ji xalên ku statuya kurdan fermî diyar dike bernedin, 'divê tiştê bo xelkê tomet be divê bo me ne etew be'.

### AKP'ê Çolaşanên kurd çêkirin

Ez bi rastî naxwazim kurd bên hemberî hev lê roja 24'ê mehê di CNN TURK ê ji tevgera Mehmet Metînerê ku ji rojnamevanekî zêdetir wekî parêzvanê Erdogan a li hember Ahmet Turk tevdigeriya bi rastî min şerm kir. Çapemeniya tirk berê rojnevanên weke Emîn Çolaşan derdixistin hemberî kurdan û wî bi terimên nizm kurd sûcdar dikin. Ev demeke ez dibînim kesên wekî Mehmet Metîner reng kurd lê hevsar di destê sîstema tirk de derdikevin pêşiya kurdan û bê hurmetiyan li têkoşîna kurd dikin. Demekê berê ji kesek paşnavê wî Demîr ji HAK-PAR'ê anibûn hemberî Bengî Yildiz û Demîr heqaret li tevgera kurd dikir. Divê BDP/DTK bi baldarî tevbigerin kesên ku tên hemberî wan diqet bikin û bi kesên weke Metîner û Demîr re tevli bernameyan nebin.

www.arsivakurd.org

# Gul parsa dijberiya PKK'ê kir

Carek din derket holê ku Tirkiye dîplomasiya xwe li ser dijberiya PKK'ê û kurdan dimeşîne. Herî dawî Gul di civîna Lijneya Giştî ya NY'ê de ev yek îstpat kir û di hevdîtina ser lingan a bi Obama re de wekî parsekan xwest ku li dijî PKK'ê destek bidin Tirkiyeyê

**NEW YORK / ANF** - Serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul di hevdîtina ku bi Serokdewletê Amerîkayê Barack Obama re kir de ji Obama xwest ku hêj pirtir der barê dijberiya PKK'ê de piştgiriyê bidin wan.

Gul di civîna Lijneya Giştî ya NY'ê de bi qasî 15-20 deqe bi Obama re hevdîtin pêk anî. Gul diyar kir ku di vê hevdîtinê de li ser her 3 mijarên wek PKK, Iraq û Rojhilata Navîn rawestiyane. Wekî ku Gul dide zanîn dixuye ku di civîna Lijneya Giştî ya NY'ê de jî Gul serê xwe pir li ser mijara dijberiya PKK'ê êşandiye û bi taybetî der barê mijarê de wekî ku parsê bike ji Obama alîkariya dijberiya PKK'ê xwestiye. Li gorî Gul PKK ne tenê ji bo Tirkiyeyê talûke ye, ji bo Iraqê jî talûke ye û ji ber vê jî xwestiye Obama hêj pirtir alîkarî bide êrişên Tirkiyeym yên li dijî PKK'ê pêk tînin.

Qaşo Obama jî ji Gul re vegotiye ku di hevdîtina wî ya bi Serokê Herêma Federal a Kurdistanê Mesud Barzanî de Barzanî jî wisa gotiye. Li ser ve Gul ji Obama re gotiye ku li Iraqê valahiyek heye û ji ber vê jî PKK'ê biçûk nebînin û cidî li dijî PKK'ê rawestin.

Obama di vê diyaloga çend deqan de ji Gul re gotiye ku ew wî pir baş fam dikin. Ji Gul xwestiye beweriya xwe bi Amerîkayê bîne ku Amerîka dijberê PKK'ê ye.

Gul fikarên xwe yên piştî vekişîna leşkerên Amerîkayê ya ji Iraqê jî pêşkêş kiriye. Di vir de jî destnîşan dike ku Tirkiye ji bo siberoja Iraqê gumanan dikin û dixwazin hikûmeteke wisa li Iraqê bê avakirin ku hemû alî xwe di wê hikûmetê de bibînin. Balkêş e ku piştî hilbijartinê gelek caran ji hêzên siyasî yên Iraqê daxuyanî hatine dayîn û di wan daxuyaniyên de bêzariya mudaxeleya cîranên Iraqê ji bo hikûmetê dihat aşkerakirin. Herî zêde jî dihat gotin Tirkiye mudaxele dike û dixwaze hikûmeteke berjewendperestiya Tirkiyeyê dike bê damezirandin.

Obama ji bo ku pirsgirêka nav Tirkiye û Israîlê bê çareserkirin jî şîret li Gul kiriye. Ji Gul xwestiye ku ji bo aloziya nav her du welatan kêm bibe Tirkiye bêdeng bimîne. Tirkiye dixwaze Israîl ji ber kuştina 9 welatiyên Tirkiyeyê yên nav keştiya Mavî Marmarayê lêborînê bexwaze û ji bo van kuştî û birîndaran jî tazmînatê bide.



## 'Ehmedînejad bi nefretê dagirtiye'

**WASHINGTON** - Serokdewletê Amerîkayê Barak Obama ji ber nirxandina Serokomarê Îranê Mehmûd Ehmedînejad a digot destê Amerîkayê di êrîşa 11'ê Îlonê de heye şermezar kir. Obama diyar kir ku Ehmedînejad bi kîn û nefreta li dijî Amerîka û Isarîlê dagirtiye û ji ber vê van tespîtan dike.

Obama di pêvajayo civîna Lijneya Giştî ya NY'ê de tenê daxuyanî da televîzyona BBC'a weşana farsî dike. Di vê daxuyaniyê de gotinên Ehmedînejad wekî helwesteka êrîşkar û bi kîn û nefret dagirtî destnîşan kir. Obama vegot ku daxuyaniyên wisa ne ew daxuyanîne ku ji nedîtîve bên û efû bikin. Obama wiha pêde çû: "Lîderek bi van daxuyaniyên bê yom û kîndar tu xizmetê ji gelê xwe re jî nake."

Dema Ehmedînejad vê daxuyaniyê di civîna Lijneya Giştî ya NY'ê kir hin dîplomatan ew şermezar kirin û ji eywana axaftinê derketibûn.

Obama jî di axaftina xwe ya civînê de bang li Îranê kir û xwest Îran îstap bike ku bernameya nukleerî ne ji bo bidestxistina çeka nukleerê, ji bo aştiyê lî pêş dixe. Rojava diyar dike ku Îran dixwaze bi ve bernameyê çeka nukleerî bidest bixe. Îran jî vê red dike.

# Almanya penaberên tirk naxwaze

**BERLÎN / ANF** - Li Almanyayê nîqaşên li ser penaberên ku entegreyê almanî nabe didome. Hin alî dixwazin ku alîkariya civakî ya ji bo penaberê entegre nabe bê birîn. Di nava pêvajoya van nîqaşan de Wezîrê Berpirsê Entegrasyonê yê Eyaleta Bayernê Martîn Neumeyer bêzariya xwe diyar kir û got: "Ew êdî penaberên tirk naxwazin." Neumeyer vegot ku ew di vê baweriyê de bû ku penaberên mêvan ên tirk dê di nav demeke kin de vegerin, ancax wisa nebû.

Neumeyer dixwaze kesên ku neçin kursê ziman û nirxên alman hîn nebin bila alîkariya wan a civakî bê birîn.

Li gorî Neumeyer ji sedî 15'ê penaberên li Almanyayê naxwazin entegre bibin û ev jî pirtir tirk û erebin. Ji bo farisan jî diyar kir ku ji sedî 80'yê wan karkerên kalîfiye ne.

**Rewşa alman esas digirin**

Neumeyerî got ku penaberên salên 1960'an û şûn ve hatin Almanyayê venegeriyan. Ancax niha li Almanyayê 3 milyon almanên betal hene û ew ji bo îstîhdamê wan esas digirin. Her wiha pesnê pirtûka "Almanya xwe diqedîne" da û got li Almanyayê êdî ne tenê siyasetmedar û peywirdarên oldar aliyên din jî mijarê dinirxînin.

Ji 5'an yekê nifusa Almanyayê penaber in. Hikûmeta Almanyayê jî demên borî de nîqaşên li ser penaberên ku li dijî entegrasyonê li ber xwe didin bi dengekî bilind dikin. Hikûmet dixwaze kesên entekre nabe bi awayek zext lê bike. Pirtir rêbaza birîna alîkariya civakî derdixe pêş û her wiha dixwaze li van penaberan cezayê peran jî bê birîn. Tê xestin li penaberê ku zarokên xwe naşîne dibistanê 2 hezar û 500 Euro ceza lê bê birîn.

Demek berê Serokwezîrê Fransayê Nîcolas Sarkozy diyar kiribû ku Serokwezîra Almanyayê Angela Merkel jî wek wî difikire û dixwaze polîtîkayên Fransayê yên nijadperest li Almanyayê pêk bîne. Encax piştî demek ji ber ku di nav YE'yê de bertek berz bûn, rêveberên Almanyayê diyar kirin ku gotinên Merkelê şaş hatiye famkirin. Ev daxuyaniyên tên dayîn jî destîşan dike ku her diçe li Almanyayê bingeha bikaranîna polîtîkayên nijadperest yên wek Fransayê bê avakirin. Ev jî ji bo penaberên li Almanyayê tê wateya siberojeke ne diyar a tarî.

## Japonya kaptanê çînî serbest berdide

**TOKYO** - Japonyayê biryar da ku kaptanê çînî yê ku 2 hefte berê bi hinceta ketiye nav qada avê ya Japonyayê hatibû girtin serbest berde. Hikûmeta Tokyoyê dixwest ku kaptanê çînî yê xwestiye keştiya xwe bi zanîn li keştiya Japonyayê ya parazvaniya peravan dike bixe biderizîne. Kaptan li herêma ku Japonya jê re bêje "Senkaku" û Çîn jî jêre dibêje "Dîaoyu" hatibû girtin. Ligel Japonya û Çînê Tayvand jî doza maf a li vê herêmê dike. Hikûmeta Pekînê li ser mijarê têkiliya xwe birîbû.

# Îran: 2 gumanbar girtî ne

**MEHABAD / ANF** - Der barê teqîna li Mehabadê ku di encamê de 12 kes jiyana xwe ji dest da û dehan kes birîndar bûn de, dewleta Îranê got ku wan 2 kes girtine.

Wezîrê Ewlekariyê yê Îranê Heyder Muslîhî li bajarê Qûmê îdiakir ku wan grûbeke ku têkiliya wan bi teqîna li Mehabadê re heye girtine. Li aliyekî din wezîrê hundir yê Îranê Mistefa Mihemed Necar jî ku der barê teqînê û kesên hatine girtin de axivî got: "Destê hêzên derve li pişt vê grûbê heye." Der barê bûyerê de, ji nûnerê Urmiyeyê yê li parlamentoya Îranê Nadir Qazîpûr jî daxuyaniyek balkêş hat. Qazîpûr ji Ayna News re, bêyî ku kesî yan jî grûbekê destnîşan bike got: "Em ê bersiva xwînê bi xwînê bidin. Wan çawa jin û zarokên me kuştine, em ê jî jin û zarokên wan bişînin dojehê."

Koordînasyona PJAK'ê teqîna li bajarê Mahabadê ku têde 10 kes jiyana xwe ji dest da û êrîşa pêr li Seqizê pêk hatî û têde 2 kes jiyana xwe ji dest da şermezar kir. PJAK'ê diyar kir ku tu peywendiya wan bi êrîşê re nîn e.Koordînasyona PJAK'ê di der barê êrîşên li Mahabad û Seqiz pêk hatin de daxuyaniyek da. Pêr li Seqizê êrîşek çekdarî pêk hat û di encamê de zarokek 4 salî û mihafizek yê Şoreşê mirin.

## KURTE NÛÇE

### Gumana bombeyê rêwiyan tirsand

STOCKHOLM

Balafira rêwiyan a 273'ya girêdayî Riya Hewayî ya Pakistanê dema ji Kanadayê diçû Pakistanê li ser giliya bombe lê heye bi awayekî lezgîn dakete balafirgeha Arlanda Swêdê. Jinek li Kanadayê gilî kir û got: "Rêwiyek bi bombeyên li ser xwe li balafirê siwar bûye." Polîsê Kanadayê li pîlot geriyaye û balafirê daxist. Hat gotin ku gumanbar welatiyê Kanadayê ye û bi eslê xwe ji Pakistanê ye. Berdevkê Polîsê Stochkolmê Janne Hedlund diyar kir ku kesê giliya wî hatiye kirin di lîsteyeke qedexeyan de cih nagire û di kontrola ewlehiya Kanadayê de jî derbas bûye. Ligel ve jî gumnbar hat girtin.

### Bidarvekirinên li Îranê ranaweste

ESFEHAN

Hat ragihandin ku du kesên din li Îranê hatine bidarvekirin. Li gorî agahiyan yek ji wan li girtîgeha bajarê Aran û yê din jî li Girtîgeha Bîdgol a li Esfehanê hatine bidarvekirin. Li gorî nûçeya Keyhannewsê, kesek li girtîgeha bajarê Îran Aranê û yê din li Girtîgeha Birdgol a li Esfehanê hatine bidarvekirin. Li gorî nûçeyê nasnameya girtiyên hatine bidarvekirin nehatiye aşkerakirin û hat diyarkirin ku herdu girtî ji ber bikaranîna madeyên hişberiyê hatine bidarvekirin.

### Sûriye û Iraqê ji nû ve têkilî danîn

BEXDA

Iraq û Sûriyeyê piştî têkiliyê birandî yê salek carek din biryar dan ku di nav xwe de têkiliyên dîplomatîk ava bikin. Wezîrê Karên Derve yê Iraqê Hoşyar Zebarî li ser mijarê daxuyanî da ajansan. Di daxuyaniyê de got ku li New Yorkê di civîna Lijneya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî de ji Wezîrê Karên Derve yê Sûriyeyê Velîd Muallem re gotiye ku dê Iraq ji nû ve sefîr bişîne Şamê. Muallem jî diyar kiriye ku ew jî ber vê biryarê bextewar in. Zebarî destnîşan kir ku dê Sûriye jî di dema herî kin de hewl bide ku sefîr bişîne Bexdayê. Roja 25'ê tebaxa 2009'an de her du aliyan jî sefaretên xwe paşve kişandibûn û têkilên dîplomatîk hatibûn birîn. Iraqê ji ber ku rêveberiya şamê di bin destan de alîkariyê dide mîlîtanan û mîlîtan jî li Iraqê êrîşan pêk tînin têkiliyan biribûn. Sûriyeyê vê qebûl nedikir.

### Îran dê Amerîka û Isarîlê def bike

TEHRAN

Serşêwirmendê Xamaney yê leşkerî General Yahya Rahîm Safevî di konferansek de axivî. Di axaftina xwe de diyar li ser êrîşeke pêkan a Amerîka û Israîlê ya bi ser Îranê ve rawestiya. Safavî pesnê hêza Îranê da. Vegot ku hêza Îranê 'fikarê' dide dijberên Îranê û wiha pê de çû: "Hemû baregehên leşkerî yên neyarê Îranê di nav menzîla fuzeyên Îranê dene." Safavî bi pirsa "Gelo neyarên Îranê bi qasî windahiyên hemû şerê Iraqê di nav hefteyek de dê karibin bigirin berçavan" xwest çavê Amerîka û Israîlê bitirsîne. Safevî xwest Washington û Tel Avîv vê rewşê li ber çavan bigirin û hesabên êrîşê ya bi ser Îranê re nekin. Safavî qala tecrûbeyên Îranê ya şerê Iraqê ku 8 sal dom kiribûn jî kir û bi van hişyariyan jî kir: "Heke êrîş bê kirin dê hêzên Îranê ne tenê van hêzan ji bejа, hewa û deryayê biavêje, her wiha dê heza ber mala wan jî bide pey wan. Safevî bi girtina Kendava Hurmuzê gef xwar û hemû baregehên leşkerî yên Amerîkayê û Israîlê bikin hedef û bersiv bidin. Amerîka û Isarîl her ku derfet dibînin û daxuyanî didin destnîşan dikin ku rêbaza erîşa şer jî di nav de gelek rêbaz li ser maseyê ye.

www.arsivakurdi.org

# Piştgiriyê didin TZPKurdî

## Endamên Meclisa Jinan a BDP'ê bal kişand li ser çalakiya TZPKurdî û diyar kir ku zarok neçar dimînin ku bi zimanê biyanî xwe îfade bikin ev tişt tê wateya îhlalkirina mafan

**ENQERE-** Meclisa Jinan a BDP'ê ya navendê bi daxuyaniyeke nivîskî bal kişand ser îlhalkirina mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê û diyar kir ku ji ber neçareseriya pirsgirêka kurd gelek maf tên îhlalkirin. Meclisa Jinan destnîşan kir ku çalakiya TZPKurdî cih de dibînin û piştgiriyê didinê û her wiha jin dê bi têkoşînê xwedî li ziman û çandê derkevin.

Meclisa Jinan a BDP'ê ya navendê di daxuyaniyê de dazanîn ku bi salan e li Tirkiyeyê di dezgehên fermî de tenê zimanê tirkî tê axaftin.

Di daxuyaniyê de hate gotin ku zarokek zimanê di hembeza dayika xwe de him dibe û heya dawiyê jibirnake û daxuyanî wiha




dom kir: "Zarokên kurd piştî 7 saliya xwe neçar in ku bi zimaneke biyanî xwe îfade bikin. Rewşa van a derûnî û fikrî serûbinî dibe. Mafê herî xwezayiyê ku mirov bi zimanê zikmakî di her qadê de xwe îfade bike. Ziman, dema zaroka mezin dibe û kesayetiya wê derdikeve cihek girîng dilîze."

**Rojnameya Azadiya Welat**

Di daxuyaniya meclisê de hate destnîşankirin ku heke bixwazin gelek ji holê rakin bila zimanê wî qedexe bikin û ev polîtîka 30 sal in li ser erdnîgariya kurd pêk tê. Meclisa jinan ev tişt vegotin: "Hate gotin ku bi navê hewladên demokratîk astengiyên li ser ziman hate rakirin, lê heya niha gelek rêveberên me ji ber ku kurdî axivînê ceza lê hate birin. Rojnameya rojane ya kurdî Azadiya Welat bi dehan caran hate girtin, xebatkarên van hatin binçavikirin. Midûrê Nivîsaran Vedat Kurşun 166 cal 6 meh ceza lê hate birin. Li gel hewldanên demokratîk, astengî û zextan gelê kurd xwedî li zimanê xwe derdikeve."

Di dawiya daxuyaniyê de hate diyar kirin ku ji ber ku pirsgirêka kurd careser nabe maf tên îhlalkirin û meclisa jinan piştgiriyê dide çalakiya boykotê ya TZPKurdî.

# Divê hikûmet demildest gavan bavêje




**WAN-** Meclisa Jinan a Wanê ji bo şermezarkirina bûyera Colemêrgê pêk hatî çalakiya rûniştinê li dar xist. Jinan di çalakiya rûniştinê de destnîşan kir ku divê li hemberî biryara bêçalakîtiya PKK'ê bersivek bê dayîn.

Meclisa Jinan a Bajarê Wanê bi çalakiya rûniştinê bûyera Colemêrgê şermezar kir û xwestin bersivê bidin biryara bêçalakîtiyê. Jinan li Parka Feqiyê Teyran çalakiya xwe pêk anîn. Nûnerên sazî û rêxistinan jî tevli çalakiyê bû. Di çalakiyê de endama meclisê Pinar Saruhan û endama Înîsiyatîfa Dayikên Aytiyê Hanîfe Kaçak axivî.

Saruhan, di axaftina xwe de bal kişand ser bêçalaktiyên demên borî yên PKK'ê û destnîşan kir ku gelek caran biryarên bêçalaktiyê hate sabotekirin. Saruhan, da zanîn ku piştî bûyera Colemêrgê daxuyaniyên rayedarên dewletê mirovan xist nava fikaran. Saruhan, got ku bajarê ku di referandûmê de di hêla boykotkirinê de serkeftî derketibe çima bûyerek wisa pêk hat divê mirov baş bifikire. Hanîfe Kaçak ji di axaftina xwe de diyar kir ku divê dewlet bersivek bide biryara bêçakîtiya PKK'ê.

## Îmha û înkar çareserî nîn e

**ŞIRNEX-** Meclisa Jinan a Cizîrê jî ji bo balê bikişînê ser çareseriya pirsgirêka kurd meşek li dar xist. Jinan destnîşan kir ku êdî polîtîkayên înkar û îmhayê terê nake û divê dewlet bikeve nav hewladên demokratîk.

Jinan ji ber avahiya şaredariyê heya Qesra Hikûmetê meşiyan. Piştî meşê endama Meclisa Giştî a Bajar Sarya Olmez, daxuyanî da û diyar kir ku di şerê ku li ser erdnîgariya kurd de pêk hatî herî zêde jin bûn mexdûr.

Olmez, da zanîn ku bi encama têkoşîna 30 salan kurd hatin asteke gelek girîng. Olmez, daxuyand ku divê hikûmeta AKP'ê rayedarên dewletê divê bersivek bide biryara bêçalakîtiya PKK'ê.

Her wiha piştî meş û daxuyaniyê çalakiya rûniştinê hate lidarxistin.

## Li Amedê jinek kuştî hate dîtin

**AMED -** Li Bîsmîla Amedê jinek bi navê Behiye Yildiz bi guleyê kuştî hate dîtin. Hate zanîn ku li Îstasyona Petrolê ya 2 kîlometre derveyî navçeya Bîsmîla Amedê jinek bi navê Behiye Yildiz ku bi guleyê hatiye kuştin hate dîtin. Welatiyê ku cesetê Yildiz dît, agahî da polîsan. Piştî polîs hatin cihê bûyerê, nasnameya bi navê Behiye Yildiz li ser cesedê dîtin û cesed ji bo rapora otopsiyê rakirin Saziya Tipa Edlî ya Amedê. Dozgerê Komarê yê Bîsmîlê tekildarî bûyerê lêpirsîn da destpêkirin.

## Ji bo Munevver Karabulut derketin kolanan

**STENBOL -** Aktîvîstên Platforma Em dê Kuştina Jinan Rawestînin, bi armanca balê bikşînin ser qetilkirina jinan vê hefteyê ji bo doza kuştina Munevver Karabulut a li Edliyeya Bakirkoyê hate dîtin çalakî pêk anîn.

Jinan di çalakiyê de pankarta "Dewlet! kujerê jinan neparêze. Em şopdarên dozê ne" vekirin û wêneyên Munevver Karabulut rakirin. Li ser navê jinan Berna Gorgulu, daxuyanî xwend û diyar kir ku dê hesabê hemû jinên hatine qetilkirin ji berpirsiyaran bipirsin. Gorgulu, anî ziman ku ew destûr nadin ku doza Munevver Karabulut bê encam bimîne û heta sucdar bên cezakirin dê têbişokin. Gorgulu, da zanîn ku malbata Garîpoglu dewlemend in û dê bi malên xwe dozê asteng bikin, lê ew destûr nadin vê yekê. Gorgulu, bibîrxist ku polîs, medya û alîgirên dewletê bi sekn û feraseta xwe piştgiriyê didin kujeran û wiha axivî: "Em dizanin ku di kuştinên jinan de ceza tên daxistin û sûcdar tên parastin. Lê em vê yekê adîl û hiqûqî nabînin. Em dê li hemberî vê yekê têbişokin. Em destûr nadin ku di doza Munevver Karabulut de ev bêedaletî pêk bê. " Piştî daxuyaniyê endamên Platformê çelenga reş a "Dewlet! kujerê jinan ne parêze. Em şopdarên dozê ne" li ber deriyê Edliyeyê Bakirkoyê danî û 5 deqîqeyan çalakiya rûniştinê pêk anî û dawî li çalakiya xwe anîn.




## Mamosteyê zarokan

Ev tiştên ku di cîhana mirovên mezin de dijîn, çiqas ji dilê min ê zarok re giran tê. Li berxwedan çend zehmet e û tu bizane çend zor e, mamosteyê min. Vêca yên ku dîsa dikujin mirov bin.

Vegotin, nivîsandin dibe ku pir hêsan be. Lê jiyîn, lê wateya wê, an jî tiştên ku dide hîskirin… Tu tişt nikare ew zêmar dayika min vebêje, tiştên ku ev hevok dide hîskirin. Erê rondikên dayika min. Ez jî giriyam. Ji bo memosteyê xwe Ferzad Kemanger, hem jî bi zimanek ku qet min jê fêmnedikir nameyên wî dihatin xwedin, hem jî bi wê pîrozbahiyê.

Ew û wan tişta ku digihand pîrozbahiyê. Heta dema dawî ku diçûn sêdariyê wêneya herî dawî ku dîrok didît bidîta dabû mirovan. Wî û hevalên wî yê rê, ol, ziman rengên wan çidibe bila bibe ên ku li hemberî zilim serî netewandine "Wêneya jiyanek bi rûmet" hiştin ji bo pêşerojê… Ferzad mamosteyê mirovên ji bo nirxên mirovahiyê şer dikin bû. Ew mamosteyê ên ku di hemû temenan de têkoşînê didin meşandin bû. Ew mamosteyê wan zaroyên ku bi çavên xwe yê biçûk ji jiyanê re amede dibin, mamosteyê hemû zarokên kurd bû.

Wî neda pey şopa yên ku ilim ji armanca wê ya rasteqînî derdixin. Tiştên ku bide wan mejiyên bedew û biçûk, her zanisteka ku fêrbike, divê bibe xizmeta civakê. Daxwaza wî, ew bû bi ronahiya ilim ya rast rûyên biçûk ronî bibe. Lewre ev yek hêsan bû? Di dîrokê de ên ku dixwestin vêna bikin nebibû dewiya wan, mirina wan? Dîrokê Erasmus dîtibû û hîn bi hezaran. Ew ilma amûra levîathana jîr, ji bo civakê dagirbike, wê qet destûr bida ên ku dixwezin vê rastiyê biguhirin.? Di nava vê pergalê de ger wek mirovek ilmê û erka te fêrkirin be, tenê tu dikarî bi pargala mêjî şuştin, bi şertê dîl girtina dil û mêjî bikî. Ew mamosteyê ji dilê me yê biçûk exlaq, hezkirin aştî, ya herî girîng jî azweriya jiyanek azad dixwest fêrî me bike. Bi hemû milan ve zarokan dikarî jê fêmbikin, bi zimanê hezar sala hatî qedexekirî ve… Celadan nikarî tehemûl bikin. Cesaret nekirin ku destûr bidin, mamosteyên rasteqîn henase bidin bistînin.

Û pênûs şikest. Ew pênûsa şikestî, di hemû dîrokê de pênûsa ilim ya rastegîn, di rastiya xwe de carek dî îmhakirin ilim bû. Paşê sêdar hate lidarxistin. Rê direj dibû ber sahpa sêdarê. Rêyek kesk cihê ku Zerdûşt lê jiyîî, warê felsafeya ku îro hemû ehlaq bingeha xwe jê digirin, li wê navendê, li Îranê ev hemû dihatin jiyankirin. Erê, mixabin ji yek wan warê peyxember Zerdûşt li îranê, mamosta 5 heval, rêhevalên xwe berbi sêdarê ve dimeşiyan. Zerdûş behsa mala di nava tavê de Garotman dikir. Yek jî ya ku berbi wê direj dibû di rêka tavê de biheşta Huvaşît. Peyva baş, ên baş, di wê riya kesk de ber bi Huvaşît e diçûn. Heta lehza dewî, bi carek tenê serê xwe li hember ên ku îxanetê li nirxên mirovan dikirin xwer nekirin. Carek tenê lewre carek tenê pars nekirin. Min got ya, jiyanek bi nirx fêrî her kesî kirin mezin, biçûk li rojhilat, rohava, bakûr û başûr. Lê belê erka wan ev bû. Ji ber wê şandibûn ser rûyê erdê, li welatê agir û rojê. Carek dî veciniqand vegera mirovên ên cewt, mutantên ku ji mirovatiyê derketin e. gotin ku werin xwe.

Şopek mezin hiştin di dilê zarokên temînata pêşerojê, çûn. Peyvek hiştin û çûn. Celadê ku ta kêşa wê şevê bi ti awayî nekarî razê. Tarîtiyek bê emsal, bi qîj qîj nişkava ji xewê veçiniqî. Dilê bi hezara zaroyên ku bibû yek, bi yek carê qîriyan.

Mamosteyê min ê dela, ew waneya te ya dawî ku te fêrkiribû em fêrbûn. Em ji bîrnekir, em ji bîr jî nakin. Em ê siberojan carek dî ji bo we biafirînin. Dibistanên ku waneyên ehlaq fêrdikin wê rojekê avabibin. Tenê hûnê bimînin siberojê re, yek jî ên weke we têkoşiyan!"

Dê celad şevekî ji xew şiyar bibe
"Dê bêje wey xwedayo,
ev çi xaçepirsek giran e?
çiqas dimrin ewqas zêde dibin.
lê ez çiqas dikujim ez xilasdibim!"

*ZÎN EVÎNAWELAT*

www.arsivakurdi.org

# Civak û perwerdehî

Zarokên kurd bi zimanê serdestê xwe tên perwerdekirin û her roj di nava pişaftina serdestên xwe de ne. Pergala perwerdehiya tirkî jî li ser hîmê netewperestî hatiye avakirin û pirengiyê qet qebûl nake û li ser yekrengiyê xwe didomînê

MÎRZA RONÎ

Dema civakê ji hev bipişkêve mirov lazim e ji takekes û malbatê destpêbike. Ji berk u takekes û malbat cewhera civakê ne.. Ji takekesekî em bigirin heta malbatê û ji malbatan jî ber bi klan-komînan, em dikarin wekî bingeh û hîmê civakê em bigirin dest. Ji van komên biçûk, civak endamên xwe berhev dike û di encamê de civakek derdikeve holê. Di nava rûpelên dîrokê de ev dîroka avabûna civakan derdikeve pêşiya me. Civaka kurd jî rista avabûna xwe, civakên din ava kiriye.

Hîmê civakan di serdema demê neolotîk de hatiye avêtin. Destpêka klanên komî, xebatên hevpar, di wê demê neolotîkê de derketiye ser rûyê erdê. Bi pêşengiya jinê afirîneriya civakî tovê xwe avêtiye ser erdê û ber bi civakbûnê ve aj û bejn daye. Ev hîmê avabûna civakî li ser erda Mezrabotan pêk hatiye û yekem car li ser Mezrabotan civak bi pêşengiya jinê ava bûne. Di roja me ya îroyîn de jî a ku erka afirandina civakê li ser xwe girtî dîsa jin in. Mirov dikarê bibêjê yê ku civakan ji hev belav û parçe dikin zihniyeta zilam a baviksalarî ye. Ji bo wê çendê ya ku civaka azad bi afirîne xeml û azadiya jinê ye.

**Dewletan civak xerab kirin**

Di nava herikîna dîrokê de civak jî herikîn û ji serdema 18'emîn pê de êdî civak ketine şiklek din. Ji bo pergalên rêveberiya civakî guharînen mezin di nava civakan de çêbûye. Pergala ku civak xistî nav xelaka xwe de pergala kapîtalîst e. Pêşdeçûyînên pîşesaziyê, erka guharîna civakê girtî ser milê xwe û komînalîteya civakê qetqetî kir. Dibin ala netewe-dewletê de civak hatî hêjandin û dewlet hatin avakirin. Piştî ku netewe-dewlet avabûn êdî qedera civakan ket destê dewletan.

Dema ku ev guherînên civakî di cihanê de çêbûn awirên dewlatan ketin ser axa Mezrabotan û hêdî hêdî êrîşên talanwarî li ser axa Mezrabotan rûdan. Di destpêkê de pêla ereban û dûvretir pêla osmaniyan xwe li civaka kurd da û ketin nava axa kurdan de. Demek dirêj tirk û kurd di nava hev de li ser axa kurdan jiyanek hevpar derbas kir, lê dewletên ku dewlemendiya kurdan ranegirtin hêdî hêdî siyaseta berjewendîparêz li ser kurdan girêdan û pergala osmanî nexweş xistin û jê re gotin 'zilamê nexweş'. Dema osmanî xistin xefka xwe êdî dem demê parçekirina axa kurdan û osmaniyan bû.

**Neteweperestî kurmê darê bû**

Dema di nava osmaniyan dejî zihniyetên netewperestî ava bûn êdî qedera kurdan ber bi guhertinê ve çû. Pêşî di şerê yekemîn ê cîhanê de dibin 'Peymana Serw'ê de ax û civaka kurdan hate parçekirin. Dûvretir netewperestiya tirkan, wekî ku birêz Abdullah Ocalan jî anî ziman xwe wekî netewperestiya Anglosakson (îngilîzan) afirand. Ji xwe di encama 'Peymana Lozan'ê de kurd êdî ne civak ne jî mafê wan î hebûnî qet nehat dîtin û netewperestiya tirkan xwe serdestî neteweya kurd kir. Piştî ku civaka kurd nehat dîtin êdî kurd di nava çar dewletan de man. Piraniya gelha kurd dinav xeta Bakur de man ango di nava pergala dewleta tirk de man. Tirkan jî xwe ji pergala osmanî xilas kir û bi pêşengiya M.Kemal komara Tirkiyeyê hat avakirin. Zihniyeta netewperestî komara netewe-dewlet ava kir û civakên di nava xwe de, li ser wan netewperestiya tirkîtî ferz kir û ji xeynî hebûna tirkan tu hebûnên din qebûl nekirin û di encamê de civaka kurd hate qedexekirin. Bi vê qedexekirinê re hebûna kurdan ket nava xetereyê. Berî her tiştî zimanê kurdî hat qedexekirin û dîroka wa li gorî tezên xwe ên tirkitiya spî nivîsandin û xwestin kurdan jî spî bikin û wan bikin tirk.




Di nava vê serpêhatiya civaka kurd de a ku civaka kurd an jî neteweya kurd êşandî qedexekirina zimanê gelê kurd bû. Ji bo ku ya neteweyê diyarde û pêşde dibe zimanê wê neteweyê ye. Komara tirk jî bi hêza ziman dizanî û berî her tiştî zimanê kurdî qedexe kir û pergala perwerdehiyê li gorî zimanê xwe û zihniyeta anglosaksonî ava kir. Ji bo civakek azad û moderniteyek azad pergala perwerdehiyê gelek girîng e. Mirov dikarê bibêjê; ji bo civakê perwerdehî teşedayîna civakê ye.

**Serdestî û bindestî**

Dema perwerdehiya civaka bindest, bikevê destê civaka serdest de, wê demê civaka serdest çawa bixwaze dê wisa teşe bidê civaka bindest. Rewşa ku em îro dibînin jî heman pergal dixwaze civaka me bike bin rûpoşê xwe de. Teybetî zarok û ciwan paşeroja civakê ne, zarok çawa bên perwerdekirin dê di paşerojê de li ser wê perwerdehiyê rûnin û di nava civakê de li ser exlaqa ku fêrbûyîn bisekinin. Ango qedera perwerdehiya civaka me heta niha ne bi ziman û exlaqa civaka me tê dayîn. Zarokên me bi perwerdehiya serdestên me tên şîretkirin û ji paşerojê re tên gihandin.

Zarokên civaka kurd bi zimanê serdestê xwe perwerdehiyê dibînê û her roj di nava pişaftina serdestên xwe de ne. Pergala perwerdehiya tirkî jî li ser hîmê netewperesti hatiye avakirin û pirengiyê qet qebûl nake û li ser yekrengî pergala xwe didomînê. Dema em jî zarokên xwe radestî pergala perwerdehiya tirkî diki; ango em jî zarokên xwe davêjin nava pergala netewperestî û yek rengî.

Em hemû dizanin dema ku zarokên me, ên diçin dibistanê, berî dest bi perwerdehiyê bikin, pêşî sonda tirka dixwînin. Naveroka wê sondê jî li gorî netewperestiyê hatiye nivîsandin. Di wê sonde de tê gotin: Tirk im, bila hebûna min ji hebûna tirkan bibe diyarî. Ji van hevokan jî zelal tê şîrovekirin ku mêjiyê zarokên me, ji mêjiyê hebûna wan tê şuştin.

**Girîngiya zimanê dayikê**

Zimanê dayikê ji bo raman û fikirandina mirovan çeka mêjî ye. Mirov bi zimanê xwe çiqas têr bibe mirov raman û dîtina mêjiyê xwe, ewqas berfereh dike. Li gorî vê pênasê, a niha zarok û ciwanên endamê civaka kurd, ne bi zimanê dayika xwe, bi zimanê serdestê xwe perwerdehiya xwe dibînin. Wê demê mêjiyê zarok û ciwanên me nikare xwe bi hêz bike û raman û dîtina xwe de kor dimînin û xwe nas nakin. Li gorî dîtina zanistî rewşa zarok û ciwanên me ev e.

Girîngiya perwerdehiyê ji bo civakê zelal û diyar e. Ji bo ku em ne hêlin bi mêjiyê zarok û ciwanê me bê lîstin, divê perwerdehiya li gorî ziman û exlaqa civakê bê dayîn. Mijara ku îro li tirkî de li ser tê axaftin ji bo me kurdan gelek girîng e. Mijara perwerdehiya zimanê kurdî a ku pêşengiya TZPKurdî ve hatî destpêkirin, ji bo civaka kurd gelekî girîng û cidî ye. Heta ku em pergalek a perwerdehiya bi zimanê kurdî di nava civakê de nedin rûniştandin, em ê nikaribin azadiya civakê bi dest bixin û civakek afirîner bidin avakirin. Berî her tiştî dive civaka me mafê pergala perwerdehiya xwe bi dest bixe. Ev pergal jî bi azadiya ziman ve girêdayî ye. Hemû hêz û rêxistinên civaka kurd dive li ser zimanê kurdî bisekinin û li gorî xweseriya civaka kurd pergalek a perwerdehiyê be avakirin.

# Ziman hişmendiya jiyanê ye

RODÎ ZINAR

Hişmendiya ziman; hişmendiya jiyanê ye.

Dema ku mirov behsa hişmendî û bi rasteqînî behsa jiyana hişmendî bike; divê mirov bi zimanekî bîne pêşberî xwe, an pêşberî kes û civakê.

Dema ku hişmendiya jiyana te çi be, heman hişmendî xwe di axaftina de derdixîne holê û mirov dikare bibêje ku mirov heman tiştî jî dijî.

Ji ber vî awayî dibêjine ku " nirxên te çi be, jiyana te ew e", "tiştên hate ser ziman binbêjinga mêjî ye" ew tiştê ku mirov behs dike; divê ziman li gorî wê jiyanê be, dema ku tu bi zimanekî bê kêmanî, li ser hêmanên rast, behsa jiyanekê bikî divê jiyan li gorî wî zimanî be.

Mîna di nivîsekê de kesê ne di hişmendiya zimanê ku ew ê beyî wergerandin de be û rabe wergerê bike; bê çiqasî ji hevdu dûr be; heman rewş ji boziman û jiyanê derbas dibe, divê parçeyê zimanê te û jiyana te li hevdu rûnê.

Dema ku mirov behsa jiyanekê bike û ziman ne gorî pergel û sistama wê jiyanê be; parçeyên ku hevdû nagirin ewê hebin û dema ku parçe li hevdu rûnenê; hergav ew ê şîrove li cihekî kêm bimîne, an tu peyva dawîn jî bibêje; ew ê hergav çav li dû bimîne ku di cihekî de kêmanî ma.

Hişmendiya ziman tahma jiyanê ye.

Dema ku mirov dest bi axaftinekê bike û kesek têkeve nava axaftina mirov; herikbariya axaftinê ji hevdu diqete, bi hevgirtina mijarê ji hevdu diqete û ji botomar kirina mijarê astengî teyî kişandin, mirov çiqasî jî mijarê xelas bike; ew tahma ku mirov feyzê jê digire xwe nade der. Heman pîvan ji bojiyan û ziman jî derbas dibe ku; ev jî ziman gorî şerd û mercên ku lê hatiye afirandin, gorî xweza û têkiliyê hatiye afirandin;

Peyvê xwe, kirpandina xwe, daçekê xwe bi cih dike û hevokê xwe saz dike û êdî xwestek û derda di rengê hêviyê de derdixîne holê.

Kesê ji bav û kalan de li ednîgeriyekê dijî û zimanê ku li heman erdnîgeriyê hatiye afirandin, dibe zimanê dayikê biaxife; xwe bi hin peyva dadigire, xwe bi hin peyva rû tirş dike, xwe bi hin peyva bilind dike û derûniya çanda ku ziman afirandiye; di nava axaftinê de derdixîne holê.

Kesê diaxife feyzê(kêfxweşiyê) ji peyva xwe digire, kesê li axafdêr guhdarî dike feyzê û sûdê ji guhdarî kirinê distîne.

Hişmendiya ziman dewlemendiya jiyanê ye.

Dema ku mirov di warê zimande hişmend be; tê wê wateyê ku mirov li tevahî jiyana xwe haydare û xwedî pîvanekê ye. Hişmendî di dû hestên xwedî pîvan û xwedî pergel de derdikeve holê.Dema ku mirov hişmendiya ziman derxistibe pêşmejiyê xwe; mirov çi biaxife; divê kesê axafdêr, li peyva xwe nesekine ku ez çi axifime? an tiştê ku ez axifim hestên min tam aniye ser ziman an na?

Divê axafdêr ji peyva xwe fikara neke.

Bê fikarî baweriyê diparêze.

Bawerî xwe di hevdan û tomarkirina gerdûnî de heyî dike.

Tomar kirineke bêqeyas di tûrikê mirov de hebe; ev tomarkirin di axaftinê de derdikevî pêşberî mirov.

Dema ku ziman dewlemend be dixuye ku di warê mejî de axafdêr têrtije û dewlemende.

Dewlemendî dibe alav û amûrên jiyanê ku; kesê guhdarî dike, an kesê miratxurê heman çandê ye, ji vê dewlemendiyê sûdê werdigire. Ev meseleya ku dibêjin "tixûbê jiyana min tixûbê zimanê min e" mirov dikare bibêje dewlemendiya mejiyê te di tixûbê zimanê te de xwe diyar dike.

Hişmendiya ziman renginiya jiyanê ye, pêşî lêgirtina pişaftinê ye. Di têkiliyê civakî de ku bi ziman pêşdetir ketiye û pêde, hin pîvan di nava civakê de têne parastin, yek ji wan dibêje filankeso/ê pirî biaqile, ji ber ku bi vî rengî an bi wî rengî diaxifî.

Dema ku mirov behsa yekî/ê ji yekî/ê dipirse ku kesekî/e çawaniye? Di bersivê de dibêjin pirî biaqile.

Di bersivê de; tu ji nêz ve nas dikî?

Dibêjin na lê çend cara min lê guhdarî kiriye.

Dema ku mirov an kesek neaxife; tê wê wateyê ku her kes mîna hevdu difikire û tu rêk û pêkê dinê nîne, lê dema ku insan diaxife derdikeve holê ku her nêzîk bûneke kesekî/ê; rengê kesayeta axafdêr tevî jiyana axaftina xwe dikî û heman renginî bandora xwe dide ser ziman û dikeve nava jiyanê, ji ber ku dibe amûrên jiyanê.

Kesê ku bibêje ez ji jiyana civakî, nûjenû û hemdemî hez dikim ku diaxifim; divê bi zimanê şênber biaxife ku van renginiya xwe derbixîne holê, lê ji bozimanekî şênber divê mirov serdestî vî zimanî be, mirov di nava zimana de serdestî zimanê dayika xwe ye, ji ber ku;

Mirov bi mantiqa ziman dizane. Mirov bi çanda têkiliya axaftinê dizane.

Mirov bi ahengî û sentaqsa ziman diaxife. Mirov ji zimanê biyanî bêhtir xwedî bêje û biwêjane. Di guhê mirovan de çîrokê ku dayikê xwendiye; bêhna dayikê jê tê. Mirov çiqasî jî şîrove bike û bibêje eman yeman bi zimanê dayikê biaxife di cih de ye, ji ber ku ziman parastina jiyana rasteqîniye.

Di demên borî de tirkî banî kesên li derveyî welat dixebitin kirin ku bila vegerin welat, hin kes hatin lî stenbolê niştecih bûn, lê bi zimanê biyanî diaxifîn. Zanist û rewşenbîrên tirk rûniştin û gotin ku ev pirsgirêkeke herî mezine, ku mirov di welatê xwe de bi zamnekî biyanî biaxife, mêldarî û baldariyeke çanda biyanî derdikeve holê û demek derbas bibe; heman jenerasyon ew ê di welatê xwe de çandeke biyanî bijî ku ev jî ji bo pêşeroja çandame, ji boaramiya civakê xeteriye…

Dema ku dewleteke serdest ji bozimanê xwe, ji boçanda xwe dikevin nava van fikara; divê kurd berî herkesî van fikara biparêze û divê herkes mîna dahnê rojê, mîna peywirdariya bibîrxistinê ji hevdu re bibêjin bi zimanêdayika xwe biaxife ku tu xerîbî civaka xwe, tu xerîbî jiyana hevpar nebe.

Ji bojiyaneke asayî; divê mirov çiqasî li dijî jiyanê baldar û hişmend be; ji bopêşerojeke aramî û têrtijî û biaqilî, divê mirov li zimanê dayikê xwedî derbikeve. An mirov dê bibe sêwiyê ziman.

# ‘Lazimo ke Tirkîya raşteya xo bivîno’

## ’Tirkîya eger mafê kurdan bido halê kurdan dê weştirey bibo. Tirkîya mecbûro ke goreya peymana navneteweyî, xo ta bidêy. Heqê heme dayîk û gedeyan esto ke, bi ziwanê xo yê makî her demî perwerde bivînê, bipawê û bimûsê’

**STENBOL / DÎHA** - Sereka beşa Fen û Perwedeheya ya Zanîngeha Bogazîçî Prof. Dr. Fatma Gok, çalakeya kurdan ya qabê ziwanê zikmakî nirxna û eşkera kerd ke, qetîyen mafê hikûmatî çîno ke mafê rewa yê perwerdeheya gedeyan, ze ewleheye bivîno û hinî nezdî bibo. No çî terorî ano vîr. Lazimo Tirkîya raşteya xo bivîno û qedexeyan werdarno ke şar û Tirkîya rehet bikero.

Boykota TZPKurdî ke qabê perwerdeheya ziwanê kurdî ya bibo ziwanê perwerdeheyî, kişta Erdogan ra ze ke çalakîya antî demokratîk bo ame mojnayiş se zî, kişta zanyar, lêkolîner, hîndekar û roşnîviran ra ze heqê kurdan yê rewa ê demokratîk yeno vînayiş û wina nirxnay. Bi her hawayî herêma kurdan di şar nêşîy dibistanan. No çîyê de çiman ver de bi û Gokî vat: “Boykot hermê kurdan di bi ser kewt. Erdogan vano ti waxtan dê kurdî nêbo ziwanê fermî. No çî dijî vatişanê min o. Ez ney qebûl nêkeni. Çimkî her netew biziwanê xo qisey kenêy. Kes nêşeno fekê kesan û çanda înan qedexe bikero.



### Mafê gedeyan esto

Gok, bi serrano ke ziwanan sero lêkolîn kena û ey warî di bîya pîspor. Eşkera kerd ke mafê gedeyan esto ke bi ziwanê makî perwerde bivînê. Û ard ziwan ke lazimo Tirkîya demê kilmî de na problema gird bivirazo û holîra wedaro û heqê rewa yê kurdan bido û vat: “Tirkîya bi nêdayişê heqê kurdan sûcdar a. Qabê ney çareserey lazimo. Her mayê şikyeno bi ziwanê xo perwerdeheya bi ziwanê makî gedeyanê xo ra biwaza. No heqê dê rewa yo. No heqê demokratîy yê şaran o. Waxta ke şarê gedeyanê nêeşrawo dibistanan lazimo ke rayîrberî bifikiryê ke problemî hal bikerê. Lazimo ke pergala perwerdeheya Tirkîyayî newera bêro viraştene.”

### Ziwan muhîm a

Gok ard ziwan ke, kesanêke bi ziwanê xo yê zikmakî waneyan bivîno se, mezgê înan daha weş beno û vat: “Gedeyanê ke dibistanî eger bi ziwanê xo perwerdehey bivînê se dê heme qadan di serkewte bibêy . No çî dê qalîteya perwerdehey zî bero asta herî berz. Hikûmat di ney çarçevoyî di gere biewno mesleyeyî. An zî nêşeno hal bikero.”

### Ziwan nîno qedexekerdiş

Gokî dîşan kerd ke, dema ma di zaf çîy polîtîk êy û vat: “Lazimo ke Tirkîya bi her hawayî ziwanan sebest vera bido. Meko armanca polîtîkayanê xo. Ti kes wa ziwanê netew ya zî dewletê çîno nêvîno û qedexe mekero. Se beno wa bibo dê roj bêro heqê pewerdeheya ziwanê zikmakî bêro girotiş û şar rehet bikero. Eger kamcin roj bibo dê heq bêro girotiş se, çira ney gamî ra ney heqî nêdanê ma. Ziwanê şarî bê welatanê êrîşkaran ra apey nêşeno xo aver bibero. No çî zaf şaş o. çicayê şaşeyî ra bêro ageyrayiş se hal dê weştirey bibo. No çî qabê Tirkîyayî şer û eyba zaf gird o. lazimo ke Tirkîya raşteya xo qebûl bikero.”

### Qursî çare nîyê

Gokî ard ziwan ke qus akerdiş çareyê esasî nîyo û vat: “Problem eger sero bêro vindarnayiş se hal dê zaf weş bibo. Lazimo kemerdimî kêmasîyanê xo bivîno û ey cayî di kemaseyî wedarno. Eger wina nêbo ser bêedaletî raçîyê nîyo. Lazimo ke Tirkîya dewletan mîyan di aver şêro û ma goreya pîmitişanê şarî têgeyrenê. Mafê waşteka kurdan yên demokratîk yê. Bi her ney ahlî lazimo ke şar hişyar bibêy û xo hemet bikerê.”

# Heskêf cayê ke qisey qedîyenê yo

**ÊLÎH / DÎHA** - Yewiyeya Heskêfî vano ‘Heskêf cayê ke qiseyî qedîyenê yo’. Û ardîy ziwan ke verê Heskêf di 20 hezar merdimîy Heskêf di estîbî. Na gam 3 hezar nufûs medno û nêşeno înan wey bikero. Û bal antî virazyayişê bendavî û koçbereya ke ey ra bîyo.

Yewiyeya Heskêfî qabê ke bal bonco encama virazyayişê bendavî ra daxûyaneyê da û vatîy: “Sozanê ke qabê Heskêfî amey dayane nînê tepiştiş û nîyanê ca. Heskêf qedera xo ra rû bi rû dayê vindarnayişî. Heskêf bêçareyo. Heskêf mexdûr o. Heskêf xemgîn o. Bi keqtişê keraya ke çend aşman verî ze ke Heskêf bi qedera xo ra rû bi rû veraday. Bi virazyayişê esasê bendavî ra koçkerdişî zî dest pê kerdîy. Waxta xo di 20 hezar nufûs Heskêfî di bîy. Na gam 3 hezar tenê mendêy û Heskêf nêşeno înan dahî wey bikero. Nufûsa ke bî zî bi kewtişê kerayî nufûsî daha zî kemî kerd. Çardeqanê ke binê qeyayî di hemeyî amey girotiş. Darbeya herî gird day Heskêfî ra. Şar bi aboreya xo ya ney gamî nêşeno xo wey bikero. Darbeyanê yê esilî, sozdayişê kesanê weçînaye û rayîrberan bi, ke nîyardî ca û hemeyî amey vîrakediş bî. Vatî ma dê çaresereyê bikerê. Ema nafîle heme sozanê xo vîra kerdîy.”

### Heskêf di qiseyî qedîyay

Çend mengan verî Heskêfî di kerayê çor ra kewtibi war û kesê cuyê xo vinî kerdibi.

Ney sero walî çardeqanê ke binê kerayî de ca girotê hemeyî girotîy. Û walî soz da ke dê çareyê bivîno. Ema hetanê ney gamî çareyê zî nîyameyo vînayiş û kerdiş. Tenê walî nê qeymeqam û şaredarey zî vat ma dê hal bikerê û vat: “Komara Tirkîyayî goreya îlkeyanê xo yê dewlet û mîletî Heskêfî di kar nêkeno. Heskêf ney ra tepeya cayê ke qiseyî qedîyayê de ya.”

### Halê ma fam bikerê

Rayîrberanê Yewîyeya Heskêfî ardî ziwan ke na gam seyî ra 60 ci esnafî yê. Waxta ke hal hina bo rewş daha de zî giran beno.

Çimkî karê ke bê ney esnafey bikerê nêmendo û vatîy: “Qabê ke rewşa ma bêro famkediş wa heme kesîy xo bikerê hurenîya ma û empatî bi kerê. Halê ma dê zaf zor dê tikey bo zî fam bikerê.

Di warê aborî di ma bi sifiran kay kenêy. Wabê ney zî rayîrberî wa çareyê halê ma ra bivînê. Ma wazenê ke çarey bêrê vînayiş.”





## *Hal weran*

*Rîyê ma bi tarî*
*Rîyê ma merdimanşi qeşeyê*
*holûn Pêşîya vilûn ser Derd*
*û keder*
*Varan û laser.*
*Ma tik û tenê mendî Sîya ant*
*sipîyan Roşnî xo da tarî şi*
*qeşeyê yarûn Bi wişk rew bi*
*rew Dar û sayêr Vil û azgilêr*
*Dinya bêrehm mend Amnan*
*gêra zimistan*
*Zimistan bi amnan Mirin bi*
*zergûn şi qeşê teyrûn.*
*Hetî deşt û aw a*
*Koyan û la wa*
*Xo dûrî megîr mi ra Bewni*
*dilê xo ra Hîşyar bi hinî*
*Zulim bestîya ra*
*Camêrd û cenî*
*Ambaz û bira!*
*Vate*

**M. MÎRZANÎ**

# Tirkîya bi bertilan û werdişanê GDO, eyseno ke dê rojanê verê ma di bileqyo

**STENBOL / DÎHA** - Dinyayî di her ke şino werdişanê ke bi genanê înan amewo kaykerdişîy pîyaseyî di geyrenê. kapîtalîstey qabê kar bikero heme çîyan keno. No zî beno semedê nêweşîyanê newe.

Pawitoxanê Kolektîfeya Ekolojîkî ra Emre Batûray Altinok, zagona ke ameyo viraştişî sero qiseyî kerdîy û vat: “Werdişanê ke genetîkanê înan bedliyawo nînê qontrolkerdiş. Bi vatişê şarî nê bi vatişê şîrketan kar yeno kerdiş.”

Odeya Zanyaranê Zîraata Stenbolî û navanda Bariş Mançoyî ya Kadikoyî bi nameyê “Edeleta hewayî, GDO’yî û dema hiqûqî” panelê darfînay. Sereka diyine ya odeya zîraatî Yilidirim Derya, pawitoxê Kolektîfeya Ekolojîk Fevzî Ozgluler û pawitox Emre Batûray Atûnok beşdar bîy û vatiy: “Ewro kesîy qabê ke Çernobîlî bigeyro ser pereyan genê. Hatnê 1600 dolarî ra zî vera zereyê ci dayê. Kapîtalîzm hem kişeno û hemjî kişyayeyan sero hesabanê pereyan keno.

No çî zaf zor o. Wedişanê GDO’yê taxima kesanê hal weşan o û encama kapîtalîsteya dewletan ra yeno. Ma qabê ke bi wedişanê GDO ra baş bikerê ra sere danê dozgereyî. Eme çi heyf ke dawayî zaf derg romîyenêy.”

### Firmaya DYA paştî dano

Pawitox Batûray ard ziwan ke, hetanê ney gamî seni kewtê tora nêweşîyan, çimkî zafêreya merdiman awa qilêrine şimenêy û vat: “Hikûmatî zagona bîyo gazî viraşt ema qanûnî di çîyanê ke nêbenê tede esto. Ema no tahlîl dayê şîrketê sero. Ma bawerê çîrokankenêy. “



# Şervanên azadiyê -I-

HAMÎD DÊRIK

Her kêliya jiyana gerîlatiyê ji mirovan re dibe dîrokekî zindî û her gav û çax xwe li perdê bêriyê dide. Wekî pêlên deryaya bê bend û sînor. Xwe bi deng û reng dike. Ji bo afirandina jiyaneke nûdemî û bêhampa. Lewre çiqas em vê jiyanê bilêv bikin, çi bi riya helbest, awaz, çîrok, serpêhatî û destanan. Em ê nikaribin rastiya vê jiyanê bînin ser ziman û li ser rûpelên dîrokê xêz bikin. Ji ber ku jiyana di nava xemla van çiyayan de tê jiyankirin û mohra xwe li bedena vê xaka pîroz û azad dide. Xwedî cihekî cuda ye û her şervanekî azadiyê yê ku cihê xwe di nava refê vê bizavê de digire. Encax dikare rastî û wateya vê jiyanê ji hemû rexê wê ve têbigihîje û roj bi roj pêre ji nû ve çavê xwe li jiyanê veke. Bi rêwîtiyekî bêsekn û lebat sergovendiya vê jiyana azad û bi rûmet li deşta rojê bigerîne.

> Lê dema ku dijmin li beramberî me vê yekê fêm neke, wê gavê hêrs û kîna me dê wekî gulokekî agirê dojehê bi ser serê wan de bibare û dê wan di nava xwe de bişewitîne

Sal; 1997 bû. Cih; qada Çiyayê Spî bû. Demsal; zivistan bû û belekiyên berfê her der spî kiribûn. Hêzên dewleta tirk û nûkeran bi hev re amedekariyên xwe dikirin ji bo ku operasyonekî li ser me bikin.. Ji xwe hîn birînê şerê îxanetê yê 92- 95'an nehatibûn jibîrkirin. Di serî de tim van hêzan dixwestin bênavber hêzên me yê li van qadan têxin di nava şer de û wan bê bandor bikin. Ji bo ku serkêşiya gelê kurd bikin û Kurdistanê bifroşin hêzên serdestê cîhanê. Yên ku meseleya vî şerî nedizanî digotin ev şer şerê birakujiyê ye. Lê yê ku di nava rastiya vî şerî de jiyan dikir û roj û bi roj parçeyên ji canê xwe û dilop dilop xwîna xwe dirijandin li ser vê xaka pîroz. Rastiya vê îxaneta nayê jibîrkirin baş didîtin û li beramberî wê jî heyanî dilopa xwîna xwe ya dawiyê şer dikirin û xwe radestî vê îxanetê nedikirin. Ji ber ku rastiya vî şerî her tişt raxiste li ber çavan û bi sedan ji hevalên me canê xwe yê pakrewan di vî şerî de fedakirin. Ji wan pakrewanan rê hevala Bêrîtan a ku xwe ji serê teht û latan avêt xwarê û xwe radestî dijmin û nûkeran nekir. ji bo gihandina jiyaneke azad wekî pepûleyekî xwe gihand ezmanê bê sînor û wekî keskesorê ji ser çiyayan xwe gihande bedena kûratiya deryayan.Hêzên me yê ku li Çiyayê Spî diman derdorî 73 hevalî bûn. Wekî ku tê zanîn, ji bo gerîla her demsala zor û dijwar demsala zivistanê ye. Ji ber ku qişûlê çiyayên Kurdistanê bi berf, baran û bahoza xwe, ne wekî ti welatan e. Gelek hevalên me di van şert û mercên zor û dijwar de canê xwe dane. Ji ber ku li çiyayên Kurdistanê berf gelek dibare û her dem li serê van çiyayan ba, bahoz û bablîsok heye. Ji ber wê mirov bi hesanî nikare li van çiyayan jiyan bike. Ev yek jî parçeyekî ji jiyana gerîla ya zor û dijware. Yên ku rastiya jiyana gerîla nizanin û ji van rastiyên heyî dûrin. Bê goman her rexê vê jiyanê nabînin û gelek caran xwe dixabînin. Hêzên gerîla di vê demsalê de cihê xwe tim bi rengekî saxlem çêdikin û xwe ji bo demsala zivistanê ya zor û dijwar amede dikin. Wekî din jî, hem di milê bîrdozî û leşkerî de perwerda xwe dibînin û xwe ji boana hemleya Buharê amededikin. Ji boan vê yekê her çiqasî demsala zivistanê zorî û zehmetiyên xwe jî hebin. Lê ji milekî din ve jî demsala zivistanê ji bo gerîla demê perwerdeyê ye. Gerîla xwe di vê demsalê de ji her milî ve perwerde dik e û haziriyê xwe yê hemleya biharê dike. Her kes vê yekê dizane, heyanî dijmin jî vê yekê baş dizane. Ji ber wê tim dijmin dixwaze bi teknîka xwe ji milekîve û biriya saloxê ku ji derdoran digre. Cihê seknê gerîla fêrbibe û hêzên gerîla di baregihên wan de tengavbike. Ji milekî din ve jî, perwerdeya hevalan tevlîhevbike û bi hemû şêwazan dixwaze encam ji vê yekê bigr e.

Xweş tê bîra min, dem nêzîkî cejna remezanê bû û hemû xelik û alemê haziriyên xwe yê cejnê dikirin û çiwîn û hatin pir hebû di vana gund û bajêrên li derdorê heyî. Lê tevgerê hêzên dijmin û îxanetkaran, ne ji boan cejin û xêrêbû. Wekî ku pêşiyê me kurdan jî gotî "av disekine, lê dijmin nasekine" haziriyê xwe yê şer dikirin. Li ser vî bingehî û li gorî gotinên gundiyê wê deverê. Me salox girt ku wê hêzên îxanetkar û leşkerên Tirkan bihvre operasyonekî li ser Çiyayê Spî bikin. Me jî wê gavê ji her milî ve haziriyê xwe yê çêkirina cî û kişandina erzaq û pêwîstiyên xwe temamkiribûn. Saloxa operasyonê bi derngî gihişte me, ji ber wê tiştekî ku em bikin nemabû. Tenê li pêşiya me riyekî hebû ew jî ew bû ku em li ber xwe bidin heyanî bibe êvar û ev ji qadê derkevin. Ber bi seharê ve û ji beriya ku dinya ronî bibe. Hevlên ku cihê xwe li lûtkeyê jorî me digirtin xeber dan ku hêzên dijmin li hemû gundên derdorê me amedekariyê xwe dikin û bi maşîneyan ber bi me ve tên. Bi derketina şefeqê re û piştî ku niyeta dijmin ji milê me ve baş hate xuyakirin, me xwe bi şiklê yekîneyan li derdorî cihê ku em li disekinîn belavkir û em mane li hêviya hatina hêzên dijmin. Ji ber ku hemû girên li derdorê cihê me bilindbûn, me bi hesanî tevgera hêzên dijmin ji her milîve û bi hesanî didît. Hêzên dijmin wekî moriyan rêzbûbûn û berû cihê me dihatin. Dijmin ji her milî ve em kiribûn nava çemberê de û merema dijmin ew bû ku me di wê derê de tunebik e. Ji xwe em ji nîvê şevê û şûnde û biriya hevalê ku li lûtkeyê raserî me disekinîn fêrbûn ku dijmin haziriyê operasyonekî berfireh li ser me dikie. Ji ber vê yekê û bi hilatina rojê re pîlanê dijmin û nûkeran û mebesta wan çiye ne çiye, hîn bêtir ji milê me ve xwiyadikir.

Hemû awir dizivirîn ser hejmara van leşker û nûkerên ku cihê xwe di vê operasyonê de digrin. Dijmin dixwest ku bi rengerî dizîka û bê ku heval bi wan bihisin, hevalan di nava xefletê de bigrin. Bi wî rengî derbeyekî giran li me bidin û encam ji vê operasyona xwe bigrin. Wekî ku dibêjin dixwestin wekî ava bin kayê xwe bighînin cihê me. Lê wan nidizanî ku em hên ji şevê din ve li benda hatina wane û hayê me ji tevgera wan heye. Dijmin bi leşker û teknîka xwe her devder girtibûn. Tevgera wan li ser wan sirtê beramberî me û yê ku jê re têgotin Sirtê Osmanan baş xuya dikir. Di vê oparisynê de dijmin her rengê teknîka heyî bi xwe re anî bû. Ji teng, top, hewanan bigre, heyanî qobrayan. Xuyabû ku dixwaze ku me hemûyan li vê derê tinebike.

Hêdî hêdî kelecana şer û pevçûnê nêzîkdibû û dijimin jî hin bi hin pêşde dihat. Em jî di hundirê çeprên xwe de li hêviya hatina wî bûn. Her kesî di hindirê xwe de ev bîskên bi heyecan û ne asayî jiyandikirin. Berfa li erdê bi ser û seqema xwe nedikarî vê kelecana di hundirê me de vemirîne. Ne sir û ne seqema wê berfa bi qasî gazekî ketibû û her dever sipîkiribû dikarî kelcana wan dilên ku li benda hatina dijminin bişkîne. Hemû awirên ji deryaya çavan diherikîn ser rûpelê berfa spîçokî li hev dimeyzandin, wekî ku ji hev re bibêjin; pêwîst e em wekî xelekên zincîrê pişta hev bigrin û hev bernedin. Encax em dikarin bi vî rengî dijminê li beramberî xwe bişkînin. Di hindirê her awirekî ji wan awiran de bi hezaran hestên veşartî yek bi yek xwe didane der. Di wan bîskên ji beriya teqîna guleya yekemîn de. Temenê mirov dibû çirûskek û di hindirê wê çirûskê de jî wekî mûmekî geh geş dibû û geh divemirî. Li wê derê şerê mirin û jiyanê li dar bû.

*(dê bidome)*



## Sernixwînka min

*Sernixwînka min*
*Çima tu ser nixwîn î*
*Dilê te maye*
*An tenê xak e dosta te*
*Ber bi jêr î tu?*

*Napeyîvî bi kesî re tu*
*Mîhrîcanan pîroz nakî*
*Ma ji Yezdan xeyîdî yî tu*

*Ma dê çawa bikenî*
*Çawa dil şadbibî*
*Û çawa pîroz bikî*
*Ew dilê bê mizgîn û*
*şîlan*
*Bê evîn û zîlan*

*Dêm sor bûne*
*Sorgul vebûne*
*Sernixwîn bûne*
*Di gulîstanên bêbext de*

*Hawar, hawar*
*Xwîn herikî*
*Lehî rabû*
*Li geliyê zîlan*
*Helepçe şewitî dîsa*
*Di hembêza dayikan de*
*zarok*

*Li Amedê hawar e*
*Pêtiya agir dîsa jî*
*Kulîlkên narîn diçilmisin*
*Di guldankên çavsoran*
*de*

*Ferman e dîsa*
*Kulîlkên weltê min*
*Tên pelçiqandin*
*Li paytexta dilê xemgîn*

*Ma ne bes e*
*Ma hûn dikar in,*
*nabînin*
*Ma hûn dikar in*
*nebihîsin*
*Çima kulîlk hemû*
*sernixwînin*

*Li seranserî welatê min*
*Xwîn ji pênûsên we*
*dirijtire*
*Agir ji devê we dibare*
*Û dilê we kevir e*

*Bes e*
*Bila neqermiçin*
*sernixwînkên min*
*Bila ji bîr nebin*
*Mizgîn û zîlan*
*Evîn û zîlan*
*Ew ji bîr nabin*
*Ji bîr nabin*

HECÎ AKMAN



## Qerf Henek

### Çapemeniya tirk rastiyê li gorî xwe li bêjingê dixe!.




### Reco: Zimanê kurdan nayê qebûlkirin



# Rosebîanî pirçandiya Kurdistanê vedibêje

Mizgîn ARSLAN - SAN SEBASTIAN/ ANF

Jano Rosebîanî ku bi fîlmê xwe ye bi navê 'Chaplînê Li Ser Çiyayan/ Chaplins of the Mountain' di asta post-produksiyonê de ye di Mîhrîcana Fîlman a San Sebastîan de bû. Fîlm di beşa "Cinema in Motion" di asta çêkirina amatorî de hate pêşandin. Rosebîanî diyar ku, bi vê fîlmê xweşikatiya erdnîgeriya kurd, dewlemendiya çandî û birînên ku bi salan dewam dike aniye ser ziman. Rosebîanî bersivin pirsê me da der barê fîlmê ku çêkirî de ev agahî dan; 'di heşê min de du çîrok hebûn, min herduyan ji kir yek û Chaplînê Li Ser Çiyayan derket holê. Min senaryoyê fîlmê di nava du hefteyan de bi awayeki lezgîn nivîsand. Lê bila şaş neyê fêmkirin fîlm ji mêj de di mêjiyê min de amade bû, bes min tiştên di mêjiyê min de bûn li ser kaxizan nivîsî. Di du hefteyan de min lîstikvanan jî dît. Di dimek kurt de ango di nava mehekê de min aktor û aktirêsan kom kir, min aktor ji Amerîka, Kanada û Almanyayê dîtin. Û em bi hev re çûn Kurdistanê. Di 15'ê tîrmeha 2010'an de me dest bi kişandina fîlmê kir. Hemû tişt pir bi lezgîn çêbûn. Me fîlm di 25 rojan de xilas kir.

Jano Rosebîanî di çîroka xwe ya yekemîn de behsa diya Nazê dike ku ew bûye qurbana Enfalê. Nazê li gundê diya xwe digere. Gelek jinên kurd di dema Enfalê de ji ereban re hatine firotin di navbera salên 86-87'an de. Ji ber ku mijara yekemîn wekî çîroka yekemîn li ser namûsê bû, kurdan bi vî awayî vegotiye. Derhêner Jono Rosebîanî li ser mijarê wiha got: "Min dizanibû ku ev mijar mijareke hesas e û kurd dê li ser vê mijarê neaxivin, belê wisa jî bû di serî de nedixwestin biaxivin. Dokumanên wan hemûyan hene, ew bi awayekî zindî li navenda Anfalê hêj hene. Hemû navên wan ji nivîsandine. Li Qahireyê li kerxanan ev jin hatin xebitandin. Ji ber ku em gelekî girtîne naxwazin bi rastiye xwe re rû bir û bibin. Di çîroka vê fîlmê de, diya vê keçika ciwan ji Anfalê reviya ye, ji aliyê zilameke fransî li cihe ku lê kar dikir hatiye rizgarkirin û wê ligel xwe dibe Fransayê. Dê û bavê Nazê di temeneke biçûk te mirin e. Nazê li gundê diya xwe digere. Ev çîrok demeke direj e di heşê min de bû."



Chaplînê Li Ser Çiyayan du çîrokan di hundirîne, pirçandî ye û li her çar parçeyên Kurdistanê digere. Derhênerê fîlmê Rosebîanî dibêje ku di fîlmê de esaleta kurdan xwestiye rabixe ber çavan




Derhêner Rosebîanî derbarê çîroka xwe ya duyem de jî ev tişt gotin: "Çîroka duyemîn pirçandî bû. Du kes li gundên Kurdistanê digeriyan û fîlmên Chaplîn didan nîşandan. Ev du kes ji New Yorkê diçin Kurdistanê ji bo çanda xwe bidin naskirin, mirov dibê ka ji bilî pêşandina fîlmê Chaplîn tu çanda wan tune ye. Di vê rewîtiya xwe de dixwestin sê tişt nîşan bidin. A yekemîn xweşikbûyina Kurdistanê, duyemîn folklor û çand, sêyemîn êşên kurdan yên di bên vê xweşikbûyinê de. Êş û birînên kurdan… Min dixwest ez hemû ol û çandên ku kurd dijin bidim naskirin. Wekî gundên êzîdî, xiristiyan û misilmanan… Ayinên kurdên êzîdî baweriya herî kevnar e û min dixwest ez kurdên esil û gelek kevnar bidim nîşandin."

**Fîlm bi îngilizî ye**

Derhêner Rosebîanî ji ber fîlmê ku çêkiriye ligel rexneyên erênî der barê zimanê fîlmê de jî bi rexneyan re rû bi rûdimîne. Rosebîanî der barê rexneyan de got ku ew xwestiye ji bo ku kurd ji alî sînemahezên cihanê ve baş bên fêkirin ew îngilîzî tercih kirye ango xwesteka wî kurd li her derê cîhanê bi awayekî hunerî bigerineye. Derhêner ji nedîtîve dîtina kurdî jî rexne kir û balêkişand ku fîlmên bi kurdî encax di mîhrîcanan de an jî li sînemayên biçûk ji xwe re cih nabînin. Rosebîanî dema fîlmê li Los Angelesê bi rexnegir û sînemahezan re temaşe dike, dema fîlm diqede ji wan ev pirs dike: "Hûn vê fîlmê gelo dixin kategoriya fîlmên amerîkî an ê kurd?" Amerikiyan bersiva vê pirsê bi wekî fîlm yê amerîkiyan be kurd ji wekî fîlm ê kurdan be bersivandine. Rosebîanî hestên xwe wiha anî ziman: "Min jî fîlmeke wisa navneteweyî dixwest .Projeyên min pir in, hinek bi îngilîzî, kurdî û fransî ne, dixwazim bi hemû zimanan fîlm çêbikim. Di vê fîlmê de ev e ji ber ku karakterên min ji New Yorkê hatine ku kurdî bipeyiviyana nedibû. Aktrîsa sereke nêvî fransî, nêvî kurd bû, ev ji dema ku zarok bû diya wê miribû ji ber wê ji bi kurdî nizanbû. Ji ber vê tiştê ji zimanê fîlmê bi îngîlizi bû."

Di fîlmê de ligel çend zimanên ewropî ên wekî îngilizî, fransî,îtalyanî kurdî jî heye. Derhêner bi pirzimanan dixwaze nêzbûna kurdî û zimanên ewropî bine hemberî hev Derhêner Rosebîanî ji bo nêzîkatiya zimanên ewropî jî ev mînak da: Ji bo Av a bi kurdî, fransî dibêjin 'Eau(o)', îtalyanî 'Acqua(akua)' em dibinin ku ziman çiqas nêzikê hevûdu ne"

**Fîlm kurdewar e**

Derhêner derbarê rexneyên ku fîlm fîlmeke biyanî ye jî wiha got: "Min ev fîlm ne tenê ji bo başûrê Kurdistanê çêkiriye, di vê fîlmê de ez behsa çar parçeyên Kurdistanê dikim. Diçim Qendîlê û dibînim balafirên tirk û iraniyan çiyayên Kurdistanê bombebaran dikin. Min di fîlmê de aliyê PKK'ê ye mirovî û dostaniyê dît û min ev nîşanda. Fîlm metrajdirêj e, 2 saet û 11 deqe bû lê ji berk u mîhrîcan fîlmên 90 deqeyî qebûldikin mecbûr mam ku fîlmê kurt bikim. Alan ku (nevî kurd nevî italyanî) ye bi hevalê xwe yê amerîkî re, ku çawa kurd li her derê cihanê belavbûne vedibeje. Alan ji wekî Nazê bi kurdî nizane,li zaxoyê malbata wî heye li qet neditiye. Cara yekem e ku tê Kurdistanê. Di beşa dinê de Nazê ku li Qendilê li gundê xwe digere, li vir dibe mêvanê komeke gerilayan. Aliyên gerilayan yên mirovî û rewşenbirî dibine. Di vê komê de piraniya wan jin û hunerhêz in. Koma muzikê prova digire û qeyd çêdikin."

**Bêeleqebûn kir ku biçe**

Derhênerê Chaplîn Li Ser Çiyan Jono Rosebîanî ji berk u hunera çêkirî bê eleqe hatiye pêşwazî kirin berê xwe daye Amerîkayê. Berya biçe Calîforrnîayê li Hewlêrê bi qasî du salan mîhrîcanên hunerî li Hewlêra Hêrêma Federal a Kurdistanê mîhrîcan organîze kirine. Bi qasî 5 salan Li Kerkûkê li ser fîlmek xebitiye. Projeyeke wî ya li ser Enfalê heye. Lê belê ji hikûmeta herêmî tu alîkariyê nedîtiye. Ji ber van sedeman derhêner berê xwe daye Amerîkayê xebatên xwe yên hunerî li Calîfornîaya Amerîkayê berdewam dike.

## Ji Aslîka Qadir albumek nû

AMED - Efsaneya awaza kurdî Aslîka Qadir, klîba strana "Min Navê" li Tirkiyeyê dikşîne û mizgîna albuma nû da. Aslîka Qadir, bi strana "Welatê Me Kurdistan e" ya ku di radyoya Êrîvanê dihate weşandin hate nasîn, bi rîtma tangoyê strana kurdên Sûriyeyê "Min Navê" re klîp dikişîne.Aslîka Qadir diyar kir, hemû stranên albuma nû hatine temamkirin, lê divê album hêj bê berhevkirin..

Qadir, bo organîzatorên Herêma Federal a Kurdistanê jî gazincên xwe kir û got, heta niha ji bo tu mîhrîcan an jî şahiyek nehatiye vexwendin. Qadir wiha gazincên xwe anîn ziman: "Min bihîst ku, tenê keçên ciwan vedixwînin. Pir xemgîn bûm. Bila gaziya keçên ciwan jî bikin lê bila yên ehlê karê, yên ku salên xwe dane muzîka kurdî jî vexwînin."

Aslîka Qadir niha li Almanyayê dijî. Qadir destnîşan kir ku armanca wê ji muzîkê qezenckirina pere nîn e, bes ew dixwaze ku çand û folklora kurdî bi dinyayê bide hiskirin e. Di klîba ku ji strana "Min Navê" re tê çêkirin de ligel stranê çendîn kes jî pantomimê dikin û stran bi rîtma tangoyê tê gotin.

## Şanoya jinan 'Seven' hate pêşandin

STENBOL - Çîrokên 7 jinên aktîvîstên edaletê yên têkoşîna azadiyê yên ji 7 welatên cuda "Seven" (Heft), pêr derkete ser dikê.

Şanoya xwendinê "heft"a ku derhêneriya wê ji Şanoya Turne ya Navneteweyî ya Swêdê (Riksteatern) Figen Solmaz dike, pêr li Şanogeha Muammer Karaca hate pêşandan, peyama, "her çend şîdet û hejarî bandorê pirtir li jinan bike jî hêza guhertina cîhanê di destê jinan de ye" dide.

"Heft" ji hevpeyvînên bi 7 aktîvîstên jin re yên ji 7 welatên ne û bûne şahidê cudakarî û şîdetê pêk tê.

Şano ji aliyê rojnamevan Ece Temelkuran, parêzera Hrant Dînk Fethiye Çetîn, sînemager û şanoger Lale Mansur, Fusun Demîrel, Zeynep Eronat, Belçîm Bîlgîn Erdogan û Şevval Sam ve hate pêşkêşkirin.

Piştî şanoyê Fîgen Solmaz wiha axivî û got ku "Heft" ji sala 2009ê ve ye ji aliyê Riksteaternê ve li 40 sehneyên cuda hatiye xwendin- wezîr ji di nav de heta niha zêdetirî 200 kesî deng dayê û li Parlamentoya Swêdê ji aliyê parlamenterên mêr ve jî hatiye ecibandin.



## Pirtûka Rêbazên Edebî derket

BERLÎN - Ev pirtûk ji nivîsên nivîskara jin Hêvî Berwarî hatiye berhevkirin û ji aliyê Weşanên Yekitiya Nivîskarên Duhokê hatiye çapkirin. Yek ji projeyên yêkitiya nivîskarên Duhokê ew bû ku berya konferansa 6'emîn 22 pirtûkên kurdî bêne çapkirin.

Di nava vî pirojeyê de pirtûka balkêş a Hêvî Berwarî bû. Ev pirtûka ku ji 260 rûpelan pêk tê û bi tîpên kurmancî hatiye nivîsandin, di nava rûpelên vê pirtûkê de gelek mijarên girîng cih girtine û bi şêwekî lêkolîn mijarên wêjeyê anîne ziman.

Her wisa ji dîroka van rêbazan heta xwe di gihîjîne wêjeya nûdem, ji dema piştî ronesansê heta roja îro wêjeya ewropî û ya Rojhilata Navîn a kurdî jî têda cih girtiye. Ji bo dewlemendkrina pirtûkxana kurdî vê pirtûkê jî cihek taybet girtiye.

## Ji nû ve stranên Meryemxanê tomar kirin

DUHOK- Li Herêma Kurdistanê, berhema Meryemxan a ku ji 21 stranan pêk hatî, di nav çarçoveya xebatên Enstîtûya Kelepûra Kurdî, Yadîgariyên Hunermendên Navdar ên Kurd de hate amadekirin û hate belavkirin.

Ev berhem beşek ji stran û lawikên ji gencîneya arşîva destkeftî yên Meryemxanê li xwe digre. Ev demek bû li Beşa Vekolîn û Berhevkariya Enstîtûya Kelepûrê Kurdî li şaxê Dihokê berhevkirina arşîva berhemên Meryemxanê û ronkirina li ser jiyan û hunera wê kar dihate kirin.




Hêjayî gotinêye ku di nav heft salan de Enstîtûya Kelepûrê Kurdî ji arşîvên 21 hunermendên Kurd ên navdar bi navê Yadîgarî ji koleksiyonên hunermendên wekî; Kawîs Axa, M. Arif Cizîrî, Hesen Zîrek, Elî Merdan, Eyşe Şan, Tehsîn Taha, Mezherê Xaliqî, Hesen Cizîrî, Gulbihar, Meryemxan û gelek hunermendên din çap û belav kir.

## Kurd beşdarî Mîhrîcana Amazîgê dibin

BEYRÛT - Hate ragihandin ku sînemaya kurdî beşdarî Mîhrîcana Fîlman a Amazîgê ku li bajarê Agadîra Fasê tê lidarxistin dibin. Li gorî nûçeya kovara "Jonis du Maroc" ya bi zimanê fransî ragihand ku festivala bi çavdêriya Enstîtuya Şahane ji bo rewşenbîriya Amazîgê û bi hevkariya Navenda Sînemaya Fasê û komîteyeke sînema ji "Werzazat" bi rê ve diçe. Ev festivala cara yekem e ku mêvandariya sînemaya kurdî dike ku di festivalê de 31 fîlmên cihêreng ji welatên wek Cezair, Nîjerya, Tirkiye û Fas cih tê de digirin.

Rupel 12+++++++++:Layout 1 25.09.2010 14:32 Page 1



# Rojeva Welat

26 Îlon 2010 Hejmar: 19 Sal: 1 www.welat.com

**ROJEVA WELAT**
**Zozan Basın Yayın Adına**
**İmtiyaz Sahibi:** Eser UYANSIZ
**Yazı işleri Müdürü:**
Sevim KAPLAN

*Yönetim Yerî:*
Diclekent Bulvarı
Termil Apt. Kat:3 No:9
Kayapınar / DİYARBAKIR
*İdare Tel:* 0 (412) 251 38 88

*Yayın (Weşan)*
*TEL:* 0 (412) 237 48 90-91
*Fax:* 0 (412) 237 48 89
Baskı *(ÇAP):*
*Stenbol:* Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Telsizler Mevkii Beşyol Mah.
Akasya Sok. No: 23/A
Küçükçekmece / İstanbul
*Tel:* 0 (212) 580 63 81
*Edene:* Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad.
*No:* 44 Seyhan / Adana
Yaygın süreli yayındır.

# Perestgeha bîr û baweriyan Sermasîk Dêra Sor

**Mehmet Alî ERTAŞ - AMED**

Ji baweriya rojê bigire heta baweriya pût û heykelan, ji baweriya sewalan bigire heta baweriya stêrk û heyvê û ji baweriya Zerdeştê Kal bigire heta baweriya Xwedê gelek bawerî hatin û çûn. Her baweriyekê bi xwe re çand û warek hişt. Her baweriyekê bi xwe re berhem û dîrokek hişt. Û her baweriyekê bi xwe re kok rîşek hişt. Lê ji ber ku her tim şaristanên serdest û dagirker mafên hindik û kêmanan neparastine; çûne kijan warî, ew der wêran kirine û hemû nirxên wan ên olî, civakî, çandî û siyasî înkar kirine. Ji ber vê yekê gelek mizgeftên dîrokî yên li Rihayê di serî de sînegog, piştre dêr û bi hatina Osmaniyan re jî bûne mizgeft. Dêra Sor ango Dêra Sermasik jî xwedî heman bîr û boçûn e.

Riha warê pirbawerî û pirçandiyê ye. Bi şûn û niştecihbûna mirovahiyê baweriyên cuda li Rihayê pêş ketin. Bi van bîr û baweriyan re warên îbadet û ayîn û perestiyê pêş ketin

**Li ser sînegogekekê ava bû**

Ev dêr di sala 435'an de ji aliyê Pîskopos Rabbula ve li ser sînegokek kevn, bi navê Dêra St. Stephan tê avakirin. Ji ber stûnên sor ên mermer wekî "Dêra Sor" jî tê binavkirin. Kevirên vê dêrê yek bi yek ji çiyayê Başûrê Rihayê ji Ocaxên kevirê kilsinî hatine kolandin. Her kevir yek bi yek hatiye şehkirin û neqişandin. Her kevirek heta ketine bingehê dêrê di gelek destan de û di bin gelek çakuçan re derbas bûye. Ev dêr ji aliyê dewlmendên Rihayê ve pişt re di salên 1170 û 1175'an de zîvirandine mizgeftê. Ev warê dîrokî heta Suryaniyên Rihayê di sala 1924'an koçberi helepê kirin wekî dêr û mizgeft dihat bikaranîn. Li serderiya hundirê dêrê hin kîtabeyên bi suryanî hatine nivîsandin. Di van kîtabeyan de wiha tê nivîsandin: "Hemû dunya alem sicdeyî te dibin. Li hemberî de çong didin û şikir dikin. Ev dêra Ezîz Petrus û Ezîz Paulus, di serdema Petrîk 2'emîn Yakub û Metrepolît Mar Gregorîus Davit de, bi alîkariya gelê suryan ê mûmîn di sala Yunan Ş a 2110'an de hate avakirin. Xwedê hemû kesên keda wan têde biparêze." Li gorî hin çavkaniyan jî tê gotin ku ev dêr di sala 1924'an de didin Îdareya TEKEL'ê û zivîvirînin febrîqeya bikaranîna tûtinê. Piştre jî dikin depoya tiriyê şerbet û şerabê. Avahî ji ber gotina TEKEL'ê bi fransizî tê wateya "Regîa-rejî" di heman demê de Dêra Rejî jî tê zanîn. Tê gotin ku dema dêr hate restorekirin, 7-8 kevirên goran hatin dîtin û niha ev kevirên nivîsa suryanî li ser wan tên nivîsandin li muzeya Rihayê tên parastin.

Piştî restorasyonê heta demekê dîsa wekî atolyeya xaliyan jî hate bikaranîn.

Di serdema komarê de kuleya saetê li ser Kuleya Nakosê hatiye bi cih kirin. Ev kuleya saetê niha saeta herî mezin a bajêr e. Di binê hewşa Dêra Sor de bîra pîroz heye. Tê totin ku di 1'emîn sedsala piştî Îsa de Hawariyê Qralê Rihayê Abgar Adday kefen (destmal) a Hz. Îsa di ava vê bîrê dakiriye û ji ber vê yekê wekî ava pîroz ango bîra pîroz tê zanîn.



**Kuleya Nosê ya 8 wec**

Di hewşa Dêra Sor de Kuleya Nakosê ya 8 wec heye. Tê gotin ku dirêjahiya bilindahî û dirêjahiya kuleyê bi qasî hev dirêjin. Kuleya Naqosê ya Dêrê wekî mînareya mizgeftê bikar anîne. 3 beşê avahiyê ji kuleya dêrê, beşa jor jî a saetê jî ji mînareya mizgeftê pêk tê. Hewşa Dêra Sor vedibe qada Stêrk û Kolana Deriyê şevreş. Stûn û serên hin stûnên dêrê heta îro jî reng û fûgurên li ser xwe parastine. Dêr li navenda Rihayê hatiye avakirin. Ji 3 nefan pêk tê. Di plana bazilîkal de pêk hatiye. Ser nefişên wê bi tonozên çeporast hatiye pêçan. Nefî bi rêza stûnan ji hev cuda dibin.

**Mîmariya wê**

Piştî serdema Osmaniyan vê dêrê dizivîrînin mizgeftê û wekî Mizgefta Sor bi nav dikin. Mizgefta Mezin ango Mizgefta Sor, li navenda bajar, li Qada Yildiz a taxa Camî-î Kebîr hatiye avakirin. Ji ber xetên sor ên vê dêrê û stûnên wê yên mermer wekî Dêra Sor ango (Dermesik) jî tê gotin. Di dîwarê mizgeftê de fîgur û mîmariya ji serdema dêrê maye hêj zindîbûna xwe diparêze. Dîsa nexşa serê stûnên vê mizgeftê û di ketina deriyê hewşa mizgeftê de nexş û şûna kevneşopiya dêrê hêj şopa xwe winda nekiriye. Dîsa quleyên ku niha mînareya mizgeftê ye, wê demê kuleyên Naqosa Dêrê bû. Ev kule aydî naqosên dêrê ne. Lê piştî serdestiya împeratoriya Osmanî her der wêran kirin û komkujiya olî pêk anîn. Her wiha li şûna olên xirîstiyanan olên îslamê ava kirin.

Mizgefta Mezin baş nayê zanîn ku kengî û ji aliyê kêve li ser Dêra Sor hatiye avakirin. Kîtabeyên li ser mizgeftê jî piştre li ser dîwarên mizgeftê hatine bicih kirin û dema ji nûve avahî hatiye restorekirin hatiye bicihkirin. Li gorî abîdeyên li ser dîwarê mizgeftê hatine bicih kirin, di sala 1145'an de carekê hatiye restorekirin û ev yek baş nayê zanîn ku ji aliyê kêve û bi çi rengî hatiye restorekirin. Di kîtabeya wecê rojhilatê dîwarê mizgeftê de tê gotin ku medreseya rojhilatê mizgeftê ji serdema Eyyubiyan ve hatiye avakirin. Medreseya Selahattîn Eyyubî di sala 1191'an de hatiye avakirin. Li gorî vê yekê jî tê texmînkirin ku mizgeft beriya medreseyê hatiye restorekirin û zîvirandine mizgeftê. Tê texmînkirin ku mizgeft ji aliyê bazirganan ve di serdema XII'an de li ser bingehê dêrê hatiye avakirin. Mizgefta Mezin, li Rihayê mizgefta herî kevn û dîrokî ye. Mîmariya wê baş nayê zanîn.

**Mizgeft Sor**

Avahiya Mizgefta Sor ango Dêra sor û Dêra Mizgefta Qoserê dişibin hev. Mizgefta Qoserê zêdetir bi awayekî sade û bê desen hatiye avakirin. Lê Mizgefta Sor ango Dêra Sor a Rihayê bêtir bi fîgur û neqşên li ser dîwar, derî û şibakeyên wê hatine neqişandin balê dikşîne. Ev jî dide kuşakirin ku gelek caran hatiye restorekirin û jig elek şaristan, civak û baweriyan re bûye war û meskenê îbadetê. Misgefta Sor jî li ser 22 stûnan hatiye avakirin. Sitûriya her stûnekê 110 cm x110 cm ye. Jora stûnan çeporast li hev tên hunandin. Salona mizgeftê ji 3 nefişan pek tê. Dirêjahiya hundirê salonê zêdeyî 70 metreyî ye. Firehiya mizeftê jî zêdeyî 20 metreyan e. Li gorî tê gotin ku 2 hesar mirov dikare bi hevre li salonê nimêj bike. Her wiha li dervê salonê jî nefişek li ser 11 stûna hatiye avakirin heye. Ev nefiya dervê salonê zêdetir di demsala havînan de ji bo hênkayiyê îbadet lê lê kirin. Ji ber ku dîwarê mizgefte zêdeyî metreyekê stûrin. Havînan hundirê mizeftê pir hênik e, zivistanan jî pir germ e. Mizeft herî dawi ji aliyê Şûrkavê ve hatiye restorekirin. Dîwarê hundirê mizeftê heta metreyekê bi ahşap hatiye pêçan û dîmenek balkêş hatiye avakirin. Di wî alî de mizgeftên mezin ên Amedê û Qoserê sadetir hatine avakirin. Li qubleyê mizkeftê 8 şibakeyên mezin ronahiyê didin hundirê mizgeftê.

**Kuleya Nakos**

Kuleya Nakos ji 4 qatan pêk tê. Li qata çaran cihê nakos bi mîmariyek awarete û fîgurên dîrokî hatiye neqişandin. Cihê nakos li ser çar stûnên dirêj hatiye avakirin. Mirov bi pêlokan di tunela zirav û dirêj re li dora kuleyê dizîvire heka tu derdikeve qata nakosê. Ji ber ku dema kule hate avakirin ceyran tunebû, ji bo ku hundirê korîdora pêpeloka ronî bibe, li her rasta wekî qat bi qat taq (şibakeyên) biçûk (mexzel) hatine vekirin şewqa derve dide hundir. Li katê nakos 8 şibakeyên zivar û dirêj hene. Her şibakeyek li aliyekî bajar dinere. Dema mirov derdikeve ser kuleya nakosê, bajar ji her ali de dikeve hembêza mirov. Li jir diyar dibe ku Dêr tam di navenda bajar de hatiye avakirin.

Her wiha li jora kata nakosê jî kuleya saetê heye. Kuleya saetê 4 qosî ye. Li her wecekî kuleyê saetek mezin heye.



## Çêlek TV temaşe dikin zêdetir şîr didin!

MOSKOW - Zanyarên rûsî li paytexta Rûsya Moskowê, li cihek ku televîzyon bi çêlekan didin temaşekirin, encamên balkêş bi dest xistin.

Zanyaran ji beriya niha ji bo çêlek zêdetir şîr bidin, bi wan muzîk didan guhdarîkirin, niha jî televîzyon bi wan didin temaşekirin. Çêlekên temaşeyî dîmenên çiyayan û çêrgehan dikin rojê sê lître şîr zêde didin.

Di afirên nûjen a 10 çêlekên de plazmayên ku dîmenên zozan û çêrgehan nîşan didin hatin bicihkirin. 10 çêlek jî li cihek bê plazma hatin bicihkirin.

Zanyaran piştî ceribandinên xwe encamên pir balkêş bi dest xistin: çêlekên temaşeyî televîzyonan dikin ji yên temaşe nakin rojê 3 lître şîr zêdetir didin. Li gorî vbeytaran xebatek wiha li xweşa çêlekan diçe ji ber wê jî encamên wiha tê bidestxistin.

## Diyarbakirspor nikare maçan qezenc bike

AMED - Diyarbakirspor ku tîma Lîga yekemîn a Bank Asyayê ye, 187 roj in qet maçan qezenc nake.

Diyarbakirspor di Super Lîg, Liga Yekem a Bank Asya û Kupaya Tirkiyeyê ya Zîraatê de ev 11 maç in dilîze û mixabin galîbiyet ji bîr kiriye.

Diyarbakirspor herî dawî di 27 emîn hefteya Super Lîgê de di maça Antalyasporê de 1-0 bi ser ketibû û ji 20'ê adarê heta niha qet bi ser neket.

Ji wê rojê şûnde tîma Diyabakirsporê di Super Lîgê de 7, Bank Asya 4 û Kupaya Tirkiyeyê ya Zîraatê de 1 û bi giştî 11 maç lîstin û mixabin ji van maçan 9 maç winda kirin. Tenê di du maçan de bi hev re ma. Di 12 maçên dawî de 21 gol xwarin û tenê 4 gol jî avêtin. Diyarbakirspor di 187 rojan de ango ev 6 meh û 7 roj in tu serkeftinek bi dest nexistiye.

Diyarbakirspor ku bi Suat Kaya dest bi galîbiyetê kir, di 4 lîg û maçeke kupayê de jî galîbiyet bi dest nexist. Diyarbakirspor ji 11 maçî, 5 maç bê alîgir lîstin. 3 maç li mala xwe û 2 maç jî li Enqereyê bê alîgîr lîstin.

www.arsivakurdi.org